

DUGIR

Her sê mehan carehê derdikeve • Adar 1997 hejmara

5



Lê lê bêmal ...



DUGIR

HEJMAR 6, 1997, HER SÊ MEHAN CAREKÊ DERDIKEVE

KOVARA KURDÎ LI DERVEYÎ WELET
EV KOVAR LIGOR ALFABE, VEKÎT Û RÊZIMANA
MÎR CELADET BEDÎRXANÎ DERDIKEVE

XWEDÎ

Kawa förlag

Berpirsiyarê giştî
Dr. Saîd Mele

Birêvebirên kovarê
Ehmedê Huseynî
Zagrosê Hajo
Yehyayê Yûsif

Berpirsiyarê hunerî
S. Rêzanî

Abonetiya salekê
200 SKR

Adres
DUGIR
Box 3437
165 23 Hässelby
SWEDEN

Posta elektroni
zagros.hajo@evesta.
mail.telia.com
Tel/faks
46(0)8-383934

Postgiro
692357-7


ISBN: 1400-5913

CEJNA WE PÎROZ BE

NAVEROK

- 3 Pêşgotin.....Dugir
- 5 M.Şêxo.....E. Huseynî û M. Efiî Huseynî
- 10 Serpêhatiya Bêkesê Têlo.....SelîmBerekat
- 14 Xewnzan.....Hindrên
- 15 Şevê.....M. Efiî Huseynî
- 17 James Aldridge.....Zagrosê Hajo
- 21 James Aldridge.....Jack Lisay wergera Z. Hajo
- 25 E. Xanî.....Perwîz Cîhanî
- 39 Hunermendekî Kurd.....Cengo Elî
- 42 Nêrînek li ser Proses a Kafka.....AlanêHajo
- 44 Berbisk.....Keça Kurd
- 45 Nameyeke kevnênû.....Ismaîl Taha Şahîn
- 47 Bendewariyên spêdeke.....Hoşeng broka
- 48 Daxistan welatê min e.....Resûl Hemzatov
.....wergera Samî Namî
- 50 Ji dîmenên cenga mezin.....Sebrî Botanî
- 52 Aso.....Kamîran Hirsan
- 53 Dewleta Dostikî III.....Fehed Mistefa
- 56 Wexta.....Ehmedê Huseynî

Ji Weşanên APEC`ê kitêbên nû



Her kes û dezgehên ku ji 10`an zêdetir kitêban bikirin, ji % 20 ji wan re erzanî heye. Her weşanxane an jî kitêpfiroşên ku ji 100 deneyî zêdetir kitêban bikirin, ji % 40 ji wan re erzanî heye.

Navnîşana xwestinê:
Apec-Tryck & Förlag
Box 3318
S-163 03 Spånga/Sweden

Epost-adress: apec@stockholm.mail.telia.com

Navnîşana seredanê:
Spångavägen 345, Spånga
Tel: +46 8 761 81 18
Fax: +46 8 761 24 90

Pêşgotin

“Bo koça dawîn a Eyşe Şan”

*(De yar yar Meyremê
De bav gawirê dê ecemê
aqil û hişê xortê xelkê me
li cemê
Yar yar Meyremê!)*

Birîna dengê kevnare û tenhatiya dîloka dîl û bêcare ye. Dengê birîna nêzik û dûr û avjîna velerzîna xoşxwan û lawik û tembiya rêçên sefera bédawî ye. Hebûna e, barana biranînan û mîja xewna sofîyê windayî ye. Dengê hêviyên serberdayî û dengê nalînên darbest û kevîran e, hey dengê zuha, hey dengê rehên êş û fixana bilbilên bêbuhar!

Di asoyên bejna te de, di nalenala cejna te de, di kurtépîsta şana te de, bilûrên matmayînê bi ser bişîrîna bûkan de, bi ser çîveçîva çûkan de, diçemîyan, û bîna zemînê li ber şemala kenê te direqîşî.

Bagera demê, zixtên şûna pêşîn û kêferata serîhildana jinên çavreş, li guharên te dipirsîn. De, “de nav di xwe bid-“ û vê dîmena ko ji tevna bêrîkinê dinuqute, bi dijarî di stirana girî de binimîn hey Bêmal!

Li ser bédengiya nenas a kavilên bîr û hişên zuhabûyî, di astenga berteng û lîsînordar de, tu, ey keskesora bîranînê, tu, ey serdarê girî, ey baskên subehên xwelîreng û ey guhên berbanga xaçkirî, tu, wisa melûl û bêzar berbi gulan ve, berbi hestan ve, berbi serxweşiya govendgerînên şevistana çîyan ve, koçê û herikîna demê, bar dikî.

Deng, di sîbera veçîryayî de, wek xetîreyên destê qederê, wek mirîna zelal a stêrkên gerdana te û wek westana giyanê te yî ji bihokên xatîrxwestinê, deng, bi ser êvara me de, dirîjiya. Şaneyên temenê me, laşê me yî ko ji tozê berbi tozê de direviya, û bişkojên evîndariya pêşîn a ko li ber rîtmî talankirîna zîmanekî bedew û li ber gurmîna herifandîna nasnameyêke serhişk ji dayik dibû, di paşîla (Bêmal û Meyrema) te de geş dibûn.

Tu Dengbêj î!? Tu bi zîlamên xemgîn û bi dastanên tîndar û bi hespên tîrsê dest bi sirûdên xweşmêr û evînbazan dikî.

Ma çawan dê dengbêj bimire ey Bêmal!??

Ma çawan dê tîrêj binire ey Bêmal!??

Ma çawan dê gelawêj bimire ey Bêmal!??

Ma çawan dê mirîna sergêj bimire ey Bêmal!??

Here bêmal! Wisa xemgîn, dîlşikestî û bê tembîname, berê xwe bide tarîstana bédeng û sar. Aheng û şevbuhêrkên sazbandan, govend û dîlanên xewnperestan, agir û dûmanê, nêçîr û seyranê, evîn û giryanê, û elbûma jîyanê

radestî kulîlkên hovane yên lêvên deşt û zinar û dol û pesaran bike. Çavên xwe radestî kila şevê bike. Lehiya porê xwe radestî deryaçeya Wanê bike, û sermestiya çemê dengê xwe radestê xuşîna manê bike.

Li wî rexî rondik û wêran e bêmal!

Li vî alî bêrîkirin û hêrane bêmal!

Û di navbera wêran û hêranê de, deng e.

Û di navbera me û te de, gula bê reng e.

Û di navbera jiyana te û mirina me de, stiraneke çeleng e.

De xwe ji stirana dawîn re amade bik ey dengbêja ko zeviyên giyanên me bi dengê xwe av dida.

De gernameya şîngiriyê di xêz û bendên oxira derewîn de perwerde bik ey dengbêja şêrîn, ey Eyşe Şan!

Tu çûyî Eyşe Şan!

Te welatekî wêrankirî û sînordine asê, û bajarine reşgirêdayî li pey xwe hiştine.

Te kesayetiyê çelmisî û bangine veçirayî, bîranînine bêbîr li pey xwe hiştine.

Te axeke sincirî û xwîneke germ - nûriyayî, şîngiriyê de û bavan û bêrîkirina destgirtî û yaran û te demsaline westayî li pey xwe hiştine.

Te sazbandên bêsez û dengbêjên bêdeng û peyvên mirî û helbestên zuha û serdema bazirganên xwîn û gotinê li pey xwe hiştine.

Te em jî li ber destê vê qederê, li ber zixtên vê qonaxê, li ber dergehên berfê û xwelîyê, di nav pencên daristana hawara bêwar de, hiştine.

Tu çûyî..

Ne çûna te û ne jî bendewariya giyanê me

Ne dengê te û ne jî bêzariya jiyana me

Ne şana te û ne jî çurîsîna kenê bihara me

Ne ritim û newa û ne jî rondikên guhdara me

Ne stirana evînê û ne jî xeml û şemala yara me

Ne kiras û xeftanê te û ne jî toza li ser biskên hinara me, bikêrî vê bobelatê tîn Eyşe Şan!

De rab ser xwe, kevanên çavên xwe ji tîrên kila subhanî re amade bik, bejna afsanewî ya dengê xwe, û gencîneya sirûdên evîndaran, di sînga xwe de, hînî lêewlebûna heyva çardeşevî û matmayîna rêberên nenas û gundên xwelîser û welatên bînexşe, bik!

De rabe, pirtûka evînê bigir û pencereya şîna çiyayê şêrîn vek û bibêj û bi ser keviyên kesera me de biherik:

"Lêlê Bêmal

Tu ne sêvî, sêva Melatê

sal diwazde meh di paşila

xwe de bigerînim bêmal"

Dugir

Mihemed Şêxo

Dengê şîniya me ya xweşik

M. Effî Huseynî
Ehmed Huseynî

Wexta ko roka “ Xecokê “ di defa sînga esmanê şîn de har dibû, ko rojên me ji bîstan û zeviyan, û ji bexçeyên bêsinor, ji gulgenimên ko êşa salan û derdê neteweyeke xemgîn hilgirtibûn, dihatin,

Hunermend jî dihat.

Dengbêjê sirûdan dihat...

Tê, mistekê ji zaroktiya xwe, girên ji tozê, heriya gundan û rêçên wesayî/ birîndar, labîrênta girî û westanê, dîmenên wêranê, tenhatiya zindanê, peyman û dilsojiya evîndarekî ji beja kurdistanê, li ser milên xwe hildigire. Berbi çiçek û kulîlkên bejî ve tê.

Berbi govend û dîlanên hovane de tê.

Berbi kêl û goristan û termê elendê ve tê.

berbi nexşeyên şewitî û pasvanên delke û sînoran û berbi peyva qedexekirî de tê.

Dengbêj tê,
Mihemed Şêxo tê.

Tovên êşa kevnare di dîlkê dilê me de diguvêşe. Xewna me li deşt û zozanan û li gundên bêgundî belav dike, û hêsrên me bi ser bêdengiya kavilan û xirecira koçeran û velîstina rêving û rêwiyan de direşîne.

Derdê me, derdê bêkutayî, derdê ko di bin sim û talan û fermana dagîrkeran de mîna zixuran tar û mar dibû, berhev dikir û di rêşika çavê berbangê de vedişart, û distira..

Distira..

Distira.

Di mirina rastîn de ji bo jînê distira.
Di xweşiya xweşik de ji bo şîn û giryanê distira.
Di gurîna êgir de ji bo evînê distira
Hêdî hêdî dibe hozan û mamostayê herçar rexên şînê.

Dinale,
dilerize,
diçelmise,
dişike,
digirî,
û çavê xwe ji çavê nêrgizê dernaxîne.

Ji sala ko ji dayik bû (1948) hetana roja ko şînî di ser dev re çû (1989.03.09) temenê xwe bi azar û kul û renckêşan derbas kir. Li gundê Xecokê, li tenişt Qamişloka kevoka, li bin perên dilovaniya malbateke belengaz; Mihemed Şêxo zaroktiya xwe bi dişwarî berbi ciwanîyê de dikişkişand, Bejin zirav bû. Çav reş û por gurîşkî bû. Bi kirasê xwe yî xwêdangirtî, bi şûnşopa ava zebeş û tiryê merzone, bi piyên xwas û bi neynûkên dirêj berê xwe dida gundê "Berko" û li kêleka hevalê xwe "Farûq" rûdinişt. Qiçîna nîveroja beriya Mêrdînê ye, û xwedayê germa sincirî ketiye xewa şêrîn û giran. Erê, ji qalikê gundir tenbûrekê ji xwe re çêdikin, û tiliyên M. Şêxo yên bi xemê hinekirî, dilê M. Şêxo yê ji genim, hînî alfabeya dogehî ya sazê dibin. Carekê ji caran - Cejna qurbanê ye- M. Şêxo têlên tenbûrê, bi dizî, ji bajarê Qamişlokê dikire, û wan têlan bi şarezayî li ser zendê welat û azadiyê girêdide. Gava pêşîn, bi hêrs, bi lertz, bi hêsrên dil û giyan, bi poşmanî û bi gezkirina lêvan, bi hezkirina welatê kew û şengebî û berûyan, bi dilsojî û destpakî û bi payedarî, dest pê dike. Ji qalikê gundir, gav bi gav, berbi werzên giyanê me ve tê!

Sal 1969 bû, M. Şêxo li Beyrûtê, hem hînî mûzîkê û hem jî ligel hunermend û dengbêjên kurd beşdarî şev û cejnên netewî dibû. Çend stiranên xwe çap dike, belav dike. Dengê wî, li kuçe û kolanan, li gund û bajaran, mîna ava çemekî zêlê diherike, û ji pêlên stiranê axîneke teze bi ser şevistana welatekî gemkirî de, dirije, difûre, radipere, û dizinge. Ji Beyrûtê berê xwe dide Qamişloka evînê û li karekî digere. Hunermend tê..., da ko ji xwêdana eniya xwe bijî!

Li “ Rimêlanê “ wek paleyekî xemgîn karekî peyda dike - Bîna neftê û dengê tenbûrê dê çi ji hev re bibêjin ey xwedayê kurdan!!?- Lê jiyana bindestan wisa hatiye nijandin, û jiyana hunermendê ko dilê xwe biqêşêre û di hênkayiya sira bayê sibê de bibêje(fermo welatê min!) wisa hatiye nivîsandin.

Pîştî çend mehan, nijadperestî dilive û werîsê xwe li dor qirika gapa nanê M. Şêxo dijidîne, armanc şikenandin û xistina dengê dengbêj e, yan jî bêdengkirina miletekî ye.

Zindan,

lêdan,

dîwarên tazî û reş,

û serhişkiya hunermendê evîndar.

-Emê tiliyên te ji qurm ve hilkin, wisa jê re gotin.

-Lê tiliyên dil dê çawan bên hilkinin!?

Hunermend digot û serê xwe neditewand, rûmet û rêzdariya xwe nedifiro, û bejna dirêj hêdî hêdî dibû tiliya welatê şehîd û zersosinan.

Di 1974 an de, berê xwe dide şoreşa hêvî û xweşiyê. Tenbûra xwe davêje milê xwe û taristana sînoran bi singoya stiranê ,diqelêşe. (Bejna wî û bejna çiyar çiqasî li hevdihatin ey feleka bêbext!).

Li bin siya çavên pêşmergeyan xew bêtirs e Bavê Felek!

Li ber dengê xuşîna sermedî ya Gelyê Elî Bek û Çemçemal tu yê cara pêşîn rêça azadiyê nas bikî û renckêşana bindestiyê bindest bikî Bavê Felek!

“Ji Mehabad, ji kaniya xwîna şehîdan, vê sirûdê bo we pêşkêş dikin, hingî tasîra wê li me bû“

Koç bi dû koçê de, talan bi dû talanê de, mirin bi mirin, şikestin û girî, hawar û fixan, 1975 a malkambax e û qiriktaliya têkçûna xweşmêran e.

Çinkî M. Şêxo-mamostayê şîniya me- dizane ko şînî ne bêzarî ye û ne jî bêhêvîbûn e, û dizane jî di çi wextî de, şînî, dikare bibe bêhêvî, lewra sirûda “ Xortên me lê ne bêjimar “ û bi hişmendiya hunermendan stiranên ko xweşîkbûn û spehîbûna welat diyar dikin, pêşkêşî gelê kurd dikirin.

Rast e, bi bayê felekê re giriya û li ser keviya kaviên welatekî şewitî wek dengêkî şikestî, raxistî mabû, mit û mat û bê viyan, li rêzên berz ên çiyayên di mijê de temaşê dikir û dinaliya; lê her û her “ gulê nade bi malê dinê “ û li ser gulê tê kuştin!

Sala 1983 an, piştî bêrîkirina dijar û mişextiya giyanê bêcir, berê xwe dide hêlîna zaroktiyê, berbi bayê Qamişloka narîn ve tê.

Xort, keç, pîrejin û pîremêr, zarok, darên hinar û tûyê, girên xwelîreng, şiva hesin, toza tîr û dîlovan, barana şermokî, rûbarên bîrtûj, û stêrkên havîna deştê bendemana wî dîkin. Çav, li hêviya bejna dirêj û zimanê şekir rêj, û dengê dengbêj, diqerimin, lê hunermend tê..

Bêriya dengê xwe kirine,

bêriya êş û evîna xwe kirine,

bêriya xewn û xwezayên xwe kirine.

M. Şêxo, wek qehremanekî dastanî, li ser milên xwe dîkin, wî bi baskên evîna xwe dinixumînin û wî ji zordestî û êrîşên demê diparêzin.

Ji wê êşa ko gelê kurd ji sedsalan ve di stiranekê de veşartîye, M. Şêxo tê...

Ji wan gundan, gundên biçûk û bêdeng hînî derdekî mezin dibû, bi wî derdî dijiya û bi wî derdî jiya... Bi wê taristana ko perên xwe berdabû ser hinarkên berbanga wî, jiyan himbêz dikir.

Bi zimanê rastiya sipî û tenik şîniya me wergerand, û dengê çîyan, dengê evîndaran, dengê leheng û şerbazan ji wê şîniyê afirand û bi bîna keleş û folklorê kurdî, bi reseniya kesayetiya dîrokî, û bi gêwî û jiyanê rojane ya gelê kurd ve girêdan.

Axîna xwe- Axîna ko tenê dikare axîna M. Şêxo be!- bi îstgehên welatperweriyê, bi cegerdariya pêşmergan, bi konên reş û bi reşgirêdana dayikan, bi ala rengîn û bi xwîna pîroz, dipêça, dadigirt, û bi wê axîne di ser dev re diçû!

Kelegirî, li ser derd û kulên kurdistanê distira!

Şev bê heyv bû. Keça kurd li ser piştîyekî pûş vezilandî bû. Havîn germ û sînor sincirî bûn, xwêdana hêviyê ji ser eniya xwe paqij dikir û distira!

Ji paleya ceh û genim re distira.

Ji garis û pembo re distira.

Ji oxir û xatirxwestina dawîn re distira.


Ji cenga dawîn re, ji maça dawîn re, ji çemê dawîn re, û ji xwîna dawîn re distira.

Dengê wî hildiperike nexşeya Kurdistanê.

Têlên tenbûra wî asoyên lêvên birîndar dixemilînin.

Hunermendekî rastîn bû. Ji cergê millet derketibû, û her ji bo milletê xwe, huner û stiran û saza xwe danî kêleka tivingê.

Stiran jî xebat e, wisa digot.



Xwe ji sînga Qamşlokê bernedida. (Divê ez li Kurdistanê bimirim). Axa wê diloan e, nerm e, pîroz e. (Xemgînekî mîna min gerek li axake xemgîn bê veşartin).

Lewra M. Şêxo tu carî çenteyê xwe ji bo seferê amade nedikir!

Lê Azara porkem tê, tê û reşkonekî nû vedigire, û evîndarê axê, gul û baranê, ji nav destê Qamişlokê direvîne.

Qamişlokê jî, laşê narîn û nazik li ser darbista dilê xwe dike, û bi gavine giran, bi evîneke payebilind, berê xwe dide goristana Hilêlîkê.

Pîrejînekê porê xwe dikişand û digot: “ Bejna çiya çû!!”.

Bejna ko hetanî sînorên mirinê ji kurdistanê hez dikir, vê carê bi rastî jî, çû, çû, çû.

SERPÊHATIYA BÊKESÊ TÊLO

Navê wî Bêkesê Têlo ye. Ew jî mîna her zarokekî dîtir, di çavên dê û bavê xwe de karexezalê pêşerojê bû. Diçe dibistanê. Dibistana seretayî kuta kir û berbi ya navîn de firiya. wek hespê cirdê ev qonqx jî birî da ko bigihêje xwendina lîseyê. Du qonaxên zanistê bi dawînanîn, tiştêkî pir hindik mabû, ko ew jî biqasî wê şiyana pêwist a ko wî bigihîne xwendegeha bilind; a li paytexta welatê wî yê erebî, bû. Lêbelê xewnên wî yên wê çaxê yên navnetewî, qublenameya dilê wî berbi paytexta ko wê demê paytexta nivê cîhanê bû ve, vekirin: Moskova. Dê biçe Moskovayê. Balefir dizanin çawan di esmanê naskirî de, di wê xêza ko ji çend kevanan pêk tê ko îsteghên rêça şîn in, berbi Moskovayê de, biçin.

Ne xwe, gerek, cilûbergine paqij û alavine guhdariyê ko li wê derê li bazaran nînin û tûtineke Emerîkanî peyda bike, ji cihekî dûr tê, tu kesî jê nepirsî û ne jî tu kes lê geriya, çunkî xwendevan e dêmek parastî ye, û hîlbijartina Moskovayê bixwe, ji boyî wergirtina zanîne, parastîne xurtir dike, beşdariya giyan bo “madiyetê” ye. De em herin cem partiya herêmê, cem nûnerê cîgirê komîteya herêmê wisa ligorî belavokên Oktoberê; meha azadiya nû.

Partî dikare ji Bêkes re li ser lîsteya xwe bûrsekê peyda bike, lê peydakirina pasportekê çetin e: Ha va şikestina xort



Selîm Berekat

a pêşîn li vir dest pê dike. Nijada bincêla wî ya ko li bajarine dûrî dilê welêt dijî, tu carî nediramiya ko dê rojekê ji rojan hewcedarî pasportekê bibin. Dûrtirîn cî ji bo wan gundên ko li ber destê alavên veguhestinê bûn; ligor qonaxên xwe: Ker, Qantir, Erebane, Kemyon. Hd. Lê li ser rêça Moskovayê gir û çiya û gol û derya peyda dibin.

Berê ji bo nijada Bêkes diywariya rêwîtiya salekê, wek nimûne, dikarîbû bi awayê xweamadekirinê, hinekî sivik bibe; hetanî ko mirov lawaz û ji seqem û germê çerm qemirî jî bigihîşt. Lê li ser rêça Moskovayê sînorên welatan hene, pasvan û newbetdarên bej û derya û esman hene, ji bo derbasbûna di wan deriyan re kaxezên bi mohran mohrkirî û belgeyên fermî pêwist in. Hêvî nehat birîn. Di her yasayê de kunek ji bo bi dizî lêzîvirandinê heye. Bêkes bê pasport e çinkî di stûneke taybetî de, ji stûnên defterên dewletê “MEKTÛM” hatiye nivîsandin, ev peyv jî kurtkirina nehênî ya hevokeke rewanbêj e: “Li daîreyên nifûsê ne

mûsêcel e“, angoy tunebûna belgeya yasayî ya birana (burhana) hemwelatîyê ye. Dêmek, çî biran li ser hebûna Bêkes nîn e ji bilî belgenomeya MUXTARÊ taxê, ev belgenomeya ko xwe biçirîne nikare jê re ji bilî kaxeza “Ixrac Qeydê” ya ko cî û rojçêbûna wî destnîşan dike, bi destxîne. Ne xem e.

Moskovayê li ber dest e, Bêkes jî ji xwe dijî, dêmek dê xwe ji kuna cî, li cî bizivirîne. De em berê xwe bidin Beyrûtê. Hûn pasportekê dixwazin? Hêsan e. Fermo: Pasporteke Bulgarî, nîv nazik, sext e lê bi zîrekî, digel tembînameyekê ji partiyê. De berbi rêça esman de, Dê Bêkes biqîre.

Moskovayê ya wî ye. Kurd e û pasporta wî Bulgarî ye. Tu kes bi hûrbînî li ser vê pîrsgirêkê ranewestiya: Bêkes bi pîroziya navnetewîbûnê hatiye nixumandin, aniha, li xeniyê xwendevanên nijad yekbûyî dimîne, xwendevanên ko dê derfetine, ko qet nema careke dî dubare dibin, bi dest wan bikevin, dê keçên por zer bi hêsanî û li bin perên dilovaniya çînî rakişînin zeviyên evînê. Lê Bêkes, wek gelekên dîtir, kêfa wî ji dilbijandinên serberdayî û wisa hêsan re nayê, çunkî girêdana dilê wî bi jinê ve gerekî pêgirêdana “pîrozmendî” û “qedexe-kirina” ko li wê derê ye, li ber dergehên dilbijandinê, têkçûne.

Ha va ye, ne xwe Bêkes, mêya xwe dît. Keçeke qubrusî ye, şiyar e, çetin e, di xweşî û nexweşiyê de li ser ko sira xwe pêşkêşî mêrekî tenê bike hatiye bi şîr vekirin; hetanî ko bilalûk li ser bêvilan û li paş guhan xuyanî bikin, angoy hetanî pîrtiya dûr û kûr. Demekê hevaltiya wê kir, pişt re ew ji xwe re kir jin. Hê li Moskovayê li ser rûniştekekê xwendinê bûn, lawek jê re anî, ji bo bi navkirina wî hevdu rakişandin. Wê navê wî kir “Valantîno” (evînbaz û dildar û mehrebanê maçan), Bêkes jî navê wî kir “canda”. Dayikê kurê xwe danî mala bavê xwe, li Qubrusê, û

vegeriya pasporta mêrê xweyî xwendevan, û bi zanistiyên kîmyayê û amadekirina dermanan mijûl bû, Bêkes jî serberdayî bi zanistiyên dahênana televizyonî mijûl dibû, hemî behreya xwe ji bo pêkanîna filmekî li ser helbestvanê kurd ê bêmînak “Cegerxwîn” terxane kir. Cegerxwîn helbestvanê ahengên kurdan, tu stiraneke kurdî nikare xwe ji peyvên wî yên sade, mişt girî, mişt şadî, hêsan, yên li ser hemî zimanan, rizgar bike. Lêbelê peyvên wî yên dîtir jî li hevûdu digerin, peyvên wî yên nehênî, Peyvên Cegerxwînê şoreşgêr, peyvên Cegerxwînê çînerest, peyvên Cegerxwînê ko baweriya wî bi çarenûsên gellan û bi xweşiya piştî pevcûnan, dihat. Hevalê Nazim Hikmet û Poul Elward û Aragon e. Jiyana xwe, wek “Mellayekî” misilman î zana, şîretvan, mamostayê xwendin û bilêvkirinê, bi ezmûneyên hişyariyê, dest pê kir, û ji nişkêve piştî xwe da şaşik û cubeya xwe, û li bin perên rêbaza madî bû rêberê birayetiya mirovayetiye. Dijminên wî pir dibûn, dikandaran nema tişt difrotinê û silava wî nema vedigerandin. Lê belê helbestên wî yên evîndariyê tu carî ji “mihra” stiranê qutnebûne: “Ez kevok im, kevoka reş im, li ser bana...”, ji bo kurdan dibe çavkaniya yekemîn a sloganan: “Ez kurd im, bejin bilind im...”, “ez sor im”. Pêşî Moskovayê bi dilşadî wek sergomgehê hilbijart, pişt re berê xwe da Siwêdê, hetanî mirina xwe bi destpakî xewna Vladîmîr Îlîç Lénîn diparast.

Bêkes ligel kamêraya xwe ya sînemayî berê xwe da “Cegerxwîn”, li hawirdor maseya wî, pêûsên wî, kaxezen wî, dengê wî, wênayê wî, digeriya. Li jêr sîbera zîlamê girs î xweşik çûn û hatina li bexçe jî ji bîr nekirî, zîlamê ko eger keçên wî bi cilên xwe yên kin li kolanê diyar bibûna, kurd û reşên bavên

xwe ji ser hişê xwe diçûn. Ha va ye, mebesta min Bêkes e, dawîya dawî, serencama xebata wî belgekasêtek e; ko piştî de li ser camên qalind ên televizyonan li Moskovayê û li hin welatên Ewropayê, wek silaveke bêdeng, her ko miletekî bi kêfxweşiyê kerixî bînin bîra xwe, bê weşandin.

Xwendin bi dawî hat, Bêkes û jina xwe têra xwe zanîn wergirtin, lê, dê Bêkes vegere kûderê? Pasporta wî ya ko “sosyalîzmê” çavê xwe jê girtibû, li welatekî dîtir bi hêsanî dikare bê naskirin. “Jinê! De berî min her welatê xwe û çareyekê bike” ji jina xwe re got. Jina bejinzirav û peyv lezok berî wî çû. Mizgînî jê re hat: Dê Qubrusê pêşwaziya wî wek mêvan li cem jina wî, bike. Carcaran, pêdivî û erkên mirovayetiye bi awakî bêminak zelal in, bi taybetî eger gêwîlê “Wezareta hundir” a welatekî bixwaze.

Bêkes rêça derketinê ji xwe re peyda kir- Ango ew pasporta ko ji kaxezekê pêk tê û rê dide derketina bêveger. Nexem e. Bêkes li balefîrxaneya Larnakayê peya bû. Jina wî û kurê wî ew wergirtin û bi hev re li Nîqosya ya çeleng berê xwe dan “Hêlîna malbatî”; Nîqosya payedar û bajarê dawîn ê dabeşkirî di herêmên nijada mirovî de.

Hemî ghiştin hev, ser seran û ser çavan. Lê aniha gerek civana ligel kar bê nijandin. Zanistiyên bikaranîna kamêraya sinemayî dilerizin. Li Qubrusê yên ko alavên veguhestina wênekêşana bi bizav, hildigirin, pir in, hevbeşekî wek bêkes wisa bêbelge û ko ji nişkê ve hatiye, dê çima ji wan re gerek be? Derfet nîne. Bêkes bi yewnanî û rûsî û erebî û kurdî pir baş dipeyive, û bi inglîzî çinivînê dike û çar gotinên fransî û du gotinên Elemanî û bi îtalî jî “Roj baş” dizane. Lê, derfet nîne. nexwe ka em herin li karxaneyên ko li ser van tixûban belavbûne bipirsîn, ka em herin ji

firoşgehan û ji enbarên firotinê bipirsîn; ka em herin li wan deverên ko karkerên gellên rexê rojhilatî derya sipî bi dizî û bêferman dixebitin, bipirsîn. Lêbelê Bêkes ji ber mafê rûniştina xwe ya pîroz eger kar bibîne dikare mafê kar bi hêsanî wergire, li vir di navbera rewşa wî û rewşa wan karkerên “Ne qanûnî” de cihêwaziyeke mezin heye; karkerên ko her pênc şeşek bi hev re xaniyekî kevnî herifî li ser “sînore kesk” ko çeperên pasvanan li bakur û li başûr ji hev cihê dike, kirê dikin. Gerrek li vir, gerrek li wir, û karekî ji tunebûnê çêtir li karxaneyêke boyaxê peyda dike: Bîna terbertinê ya ko mirovan sergêj dike û peşkên boyaxê ko ne şerwal û ne jî gumlek ji wan difilitin, û demjimêrên bi hevûdû ve girêdayî ji sibehê hetanî êvarê û hilgirtina bermîlan berbi alavên tevlihevkirinê de. Hîvî nîn e. Salek, dusal, sêsal, çar, pênc, heywax li windabûna dema wergirtina zanistiyên Moskovayê!!.

Bêkes biryar da ko vê rêça xwar a “qedera madî” hinekî serrast bike. Rûs, piştî têkçûna sistêman, bi awakî pir balkêş tên Qubrusê, Kompanî, firoşkar, jinên xwefiroş, dîlangerîn, mafya.

Nexwe derfeta kar li ber Bêkes firehtir dibe. Rojname ragihandinan belav dikin û bi lavlav wergêrên ko yewnanî û rûsî dizanin, dixwazin. Kompaniyên seyrane ji dayik dibin û diteqin, wek teqîna daniştûyî ya li Afrîkayê ko li wir, bi birçîbûnê û bi mirina ji birçîbûnê çareser dibe.

Dê Bêkes digel çar zimanan berê xwe bide wan. Dê bi rûsî ligor reseniya Pûşkîn û rewanbêjiya bilindgoyên soviyetan û devoka haşkirina derveyî bi zimanê Şernomerdîn bi wan re bipeyive. Dê li vir kî mêvanên we bin? Ma Ereb in? Fermo va erebiya min jî ya bi rêziman û ya bêrêziman, fermo devokên başûr, û rojhilat û hin ji devokên rojava jî. Û ji bo kesên ko bi

yewnanî dipeyivin Bêkes xawenê aqilê berxwedana analîza Berêz Kosta Afigalo ya di rojîna “Gîtîros” de, ye.

Karmendên ko pisporiya wan bi van herdû zimanan girêdayî ye, di cî de, bixêrhatina Bêkes dikin. Daxwaza me tu yî. Pişî bixêrhatinê, şeweyê ziman û axaftinê têt guhertin, têt guhertin da ko hêjayî rewşa kompaniyan be: Miaşekî hindik, lê serê her bikirekî (Zibûn, kund) jî tiştêk jê re dimîne. Baş e, pêwîst e Bêkes xwe ji boyax û terbentîna rizgar bike. Pêwîst e îca gerefêtekê û çakêtekî xweşik û şerwalekî ûtîkirî li xwe bike. Dê kurê wî mit û mat lê temaşe bike û bibêje: “Tu yê bi cilên baqij biçî kar?”. Erê dê Bêkes bi cilên paqij biçê û dê bejna wî ya dirêj dirêjtir bibe. Lêbelê di vî karî de; karê ko Bêkes dê serê her bikirekî perana bi destxîne, ji bilî çend rojan nadomîne. Tev derew û xapandin e. Şarezayîya rûsan rê nade Bêkes ko sûdekê ji bikiran qezenc bike. Na. Pêlewan in. Baş e, kompaniyên mezintir hene, di anonsa mezin de bi paydariyeke êşkere ji dayik dibin, lê ji dil jê re dibêjin: Kaxezên daxwaza kar bin, digel kaxezên pişe û zîrekiyan, digel kaxezên cîgehê perwedebûnê, digel yê hebûna te, anuhayî û paşroja te, û yê başbûna rabûn û rûniştina te, belgeya rûniştina xwe ya qanûnî, û belgeya jinanîna, û madam tu biyanî yî tika ye tu yê kopyakê ji pasporta xwe jî bînî.

Hemî daxwazên wan dikarin bi awakî ji awayan peyda bibin, lêbelê kopya pasportê? Hey hawar!

Ma tu bê Pasport î? Tu çawan derbasî vî welatî bûyî? Tu çawan ji welatê xwe derçûyî? Çi? Tu bê hemwelatî yî?!?!?! Te li Moskovayê xwendîye? Te çawan li Moskovayê xwendîye? Na. Li me negir, daxwaznameya te nayê pejirandin.

Bêkes boyax li paş xwe hişt. Peymanek bi kompaniyekê re imzekiribû lê ew xapandin, dest vala derket. Va ji nû ve li anonsan digere. Bêhêvî dibe, berê xwe dide baylozخانهya welatê xwe: “Ez dixwazim mirovên xwe bibînim”. Jê pirsî: “Tu çawan ji welat derketî, madam te mafê derketinê wernegirtiye tu nikarî mafê vegeerê jî wergirî”.

Wexta ko min romana xwe “Hozanên taristanê” ya ko di sala 1985 an hatiye weşandin, nivîsandibû, min navê Bêkes ji bo qehremanê wê hîlbijartibû. Bêkes navekî kurdîyî navdar û naskirî ye, lêbelê wê wextê ez pêrgî tu kesî nebûbûn ko bi rastî navê wî Bêkes be, hetanî ko ez rastî kirîvê xwe yê ko bi deh salan ji min biçûktir e Bêkesê Têlo, hatim. Bêkes jî pîrsgirêkeke dîtir e, pîrsgirêkeke ko palpišta wê pîrsgirêka qederiyanê ye ya ko min di “Hozanên taristanê” de ji bo Kurdekî bi karanîbû. Carcarann danê sibê, bêsoz tê cem min, pêwîst nake ko min agahdar bike, çinkî ji du salan û vir de ez bixwe serokê yê bêkar im. Ji malê dernakevim. Her li metvexê rûdinê û bi sê tiştan mijûl dibim: Zanistiyên vegotinê û angoyan, û kaxezine sipî ji bo bi destxistina buhayê kirîna nê, û ferhengine xwarinçêkirinê da ko li ser agirê wan xêzine ji xwarinê bo jin û kurê xwe amade bikim.

Çifteya min a nêçîrê jî li tenîsta min e. Ji pencereya metvexê, nêçîra balendeyên ko li ser darên miyoborosê datînin, dikim. Ma gelo kesên tenik dê ji min bixeyidin? Ma gelo helbesta tenik a ko şahîya vî gerdûnê tenik e dê ji min tore bibe?

Hesreta her çûkê ko di vê navçeyê re, bi bilindahî bifire ew e: ko çawan neketiye nav destê min. Ev balende, seet dehê sibehê, di bin zimên de pir xweş e, kirtekirta hestiyên wî, bi xweşî, di nav diranên kursiyên de, pir xweş e.

XEWNZAN



Hendirên

Ev xewn, bi te re; mîna lêpîrsîn û
sergêjahiya biyaniyê
û mîna dilbijandina masiyên di
kûrahiya te de mîşextbûyî, bi rê dikeve.
Tu, di sergerdaniya tarûmarbûyî de
dibezi.

Bi bêdengî, tu, bi gunehên xwe sîberên
xwe dikujî: Namirin!

Ev xewa pîr jî, wek kolanên bêzariyê:
Ne gor e û ne jî term e.

Rêkewtekê* wek ko kor be û
bangekê wek ko mest be, tu dibihîzî:

Nizanim ma gelo ev çîrokek e û kolana
zaroktiyê dagîr dike

yan jî sîbera çûkên efsanewî ye;
çûkên efsanewî yên bîrê ko ji xafilîtiya

Xwedê reviyar û

li ser zeviyan gumanê bi şevdêrî
sirûdên tenhatiyê distirên!?

Bi hêviyek e sar,

Bi rûyekî jibîrbûyî, misewgeriyê
dixapîne û

diçe nav deryaya nediyariyê.

Di gemiyên gējahiye de, oqyanosa
jibîrkirinê te dadîqurtîne

û bi baskên şilbûyî yên pêlan, tu
radîçelqî:

- Ev xewn li kîjan îstegehê xewnê bi
min dibîne!

Kolana zaroktiyê?

Hebûna xweliyê?

Sirguna bêzariyê?

Yan jî bîreke bê ceografya?

Li wir, kolan xewnan dibînin

Kolanek e û hawarî zaroktiyê dike.

Guman jî, bi alîkariya bagerê; pelên
xwelîreng ên jibîrkirinê

bi ser nediyariyê de belav dike..

Galîskeya** bêzariyê jî, vê xewnê,
di ceografyayeke falicbûyî de,
digindirîne:

- Ji vir a bê cih û war, ev ez im, didim
rê

û şûnşopa xwe di bin lingên qonaxan
de dihêlim.

Mîna seferê bi çavên te dibihurim:

Min nahêwirîne!

Li wî alî çavên te, stûnên baranê bi firê
dikevin

û `edema destê evînê, rimê davêje
bêbaweriyê

û gerdûn jî li ser bēnahiya çavên
bêhûdeyiyê ava dibe.

Li vî alî çavê te, kurtepista lēvên
neagahiyan e û

Xerîzeyê surralî ya helbestan e.

Ev xewn te diyarî vê pîrsê dike.

Ev pîrs e û di kolana tenhatiyê de sefer
dike.

Ev xewn mîna lêpîrsînê ye,
mîna sergêjahiya mîşextiyê ye,
Navekî diyarî vê edemê dike:

Li vî alî . . . Li wî alî!!

Li wir . . . Li vir.

* Sudfeyekê

** Erebanê

ŞEVÊ



Mihemed Efif Huseynî

Amûdê yekemîn bajarê tozê bû, piştî wê, çend bajarên dîtir rûpelên xwe yên ko balende û toz li ser wan kom dibûn, vekirin.

“Hec Ebdû” xanimên xwe yên bedew bi xwe re anîn, “Şevê” jî xanima ko tu kesî ji xelkên Amûdê di jiyana xwe de neşîya wê bibîne pê re bû. “Şevê” xwe şanî bûneweran nedikir, tenê “Dawidê Medîna” pasvanê ebedî yê kevirên Amûdê û pasvanê payedariya wê ya di navbera misînên sifir ên mizgeftê û îmamê xwîngerm de dabeş dibû, li ser “Şevê” dipeyiv” û digot:

“Şevê” ne keça “Hec Ebdû” ye, lê neviya mîrên ermenîyan e, mîrekî kurd li nik ewrên koçbarîyê û rengên dijwar ên li kêleka Gola Wanê pêrgî wê bûbû, ew revand, û piştî sê mehan ligel “Şêx Seîd” bi sêdara hişk ve li ba dibû. Mîr

baskekî xweristiyane yê Şêx bû, dema ko trênen tirkên sor dibûn, lê ewle dibû, û dema ko biharê toza gulbişkêvan dihingivand bêvil û singa nexweş, ew dida alî... Wexta ko hatin girtin, Mîrê “Şevê” piştî Şêx Seîd hatibû daliqandin... Çi hehecîk ji şasîka wî nefirîya, mirina wî jî çend kêlikan dereng ma, “Şevê” çavdêriya wan dikir, wexta ko mîrê wê hilkişîya sêdarê, bi merdî tirsîya, û cihan tev li paş xwe hişt:

- Mîrê min! Ez çi navî li kurê te bikim?

- Birîndar.. Birîndar Şevê Birîndar.

Ew baş zeftkirin û serê wî radan kêsekî ji kitana sar û zû bi zû lingên wî li ba bûn û qirika wî çemîya.. Ne toza gulbişkêvan ji erebanan derçû û ne jî Mîr dikarîbû cara dawîn hilma “Şevê” bîn bike.

“Şevê” ligel yekemîn karwanê mihaciran berê xwe da Amûdê, û Amûdê hêdî hêdî mezin bû:

- Em dê xaniyekî ji keviran û axurekî biçûk ava bikin.

Ji bilî çarox û destên ko alavên kar bûn, tişteki “Hec Ebdû” nîne, kevir li ser kevir, zemînê bi hêzdariya xwe mit û mat dike û bi hêminî qoçanên xwe pêşkêşî esmanê Amûdê dike:

Nexwe mirov bi kevirên sipî û mezin dikare herdemîya vî bajarî derbas bike!

- Lêbelê kê ev kevir anîne vê derê?

- Herikîna xwînê “Şeva” min, ey kelpîça min a giranbuha!

Û Amûdê hewcedarî pasvanekî û

goristanekê ye, hewcedarî meya

Mêrdînê û hiriya pez e, hewcedarî

tûtina “Sado” ye; hewcedarî hespên, ko

di nav mayinan û sînoran û bîna
serleşkeran de. bi hêminî dihîrin.
Li rada mehekê toz li ser destnivîsê
kom dibû... Tozeke nerm... Tozeke
şaytok û bi tenha, tozeke li ber çavên
"Hec Ebdo" derngmayî ye, û
"Birîndar" neviyê sala 1925 an ji dayik
dibe.. Qonaxine dûr û dirêj birîbûn, ji
maka "Şevê" ya xemgîn berbi ahenga
kevîrên di nav destên "Hec Ebdo" ve,
dihat, dergûşeke textînî jê re çekirin û
gerzela kewan danîn ber serê wî.
- Bi qeqqeba xwe dê bavê wî di bîra wî
de bînin.

Cifniyên mezin ên ji sifir, misînên ji
sifir, zanîna koçbariyê ya ji sifir, porê
"Şevê" yê ji sifir, kuştîyên Amûdê yên
ji sifir, Mîra gustîlka ji sifir, sifir
çingêçingê digihîne guhên "Birîndar",
û kevîr bi avahiya xwe ya nerm
dinixume, mîrlikên ko bi kar û barên
xwe mijûl dibin, û helbestine ko
binemalê kurt dikin û bi derengî di "
Hawarê" de belav dibin.

- Sifir dixwin.

"Hec Ebdo" çaroxa xwe li xwe dike, û
di jîbermaya cîhana xwe de dimire.. Zû
dimire.. Gopalê bi sifir neqîşandî,
çaroxa mezin a sor, şaşika qalind, û
demjimêra bêrîkan a ji zîv, û vagona
trêneke dûkelî, refikên bilind û pêçeka
nexşeya Amûdê, kevîrên ko li nêzî
mirina wî mabûn, tiştên wî yên
dilovan, û qefda xemgîn a çarşemiya
wî, li ser darbestê dirêjkirî ye, û
çarşema ko ew berbi sînor de dehf
dabûn, tîne bîra xwe. kaviîlên gundan û
wêranê tîne bîra xwe, derbirîna nû ya
sifira pîremêriya zû hatî tîne bîra xwe.
"Hec Ebdo" li ser darbesta bizdayî
dirêjkirî ye û bi awakî kûr dirame, bi
çavên xwe yên girtî Melayê xwîngerm
dibîne ko çawan li lingên wî yên mezin
temaşê dike, li wî xaniyê li tenişt
mirinê, kevîrên xwe û laliyên xwe yên
ji sifir tîne bîra xwe, herdû çavên
xweşik ên "Şevê" tîne bîra xwe,



tenhatiya dilovan a mîrlika xwe ya
biçûk tîne bîra xwe.. Méranî lê
vedigere lê nikare, hest dike ko hêminî
wî pûç dike, lewra ji hundir derdikeve
û di hinavên xwe de hemî kesên ko
wan naskiribû yên ko hergav linik
kevîrên koçbariya wî diman, berhev
dike.

Tîne bîra xwe.. Û "Birîndar".. Ax..
Birîndarê ko bi çarpiyan berbi wî ve
diçû, lê nikaribû ew himbêzkiriba..
Xweşik nayê bîra wî, lê dibêje:

- Eger mirin wilo ye îca ji bo çi ez
nafirim?

Û Winda dibe.. Winda dibe.. Difire, ji
kevîrên xwe û ji xanimên xwe yên
xweşik dûr dikeve, nêzikahiyê li axa
Hesenê Gunreş dike.

JAMES ALDRIDGE :

...NA, EZ JÎ MAC-GREGOR IM.

Rojeke pêncşembêyî sayî û geş ez ji Zanîngeha Teknîkî ya bajarê Brno, ji Fakulta Radyoteknîkê li cada Lidicka piştî rojeke tijî kar, derketim û min berê xwe da antîkvaryata li cada Çeska, ya li Brno bi navûdeng. Li vê cadê mirov pêrgî her tiştî û her kesî dibe, ew weke dilê Brno bi çalakî dijene. Antîkvaryat pirtûkxaneke taybetî ye, ew pirtûkên kevn bi arzanî ji xelkê dikirin û piştre bi fêdeke piçûk wan dîse difiroşin. Ew der jî bi rastî yek ji cihên ko min gelekî jê hez dikir. Pir caran mirov pirtûkên hêja li wir didîtin, wek nimûne pirtûka Kurdistan ya nivîskarên li Çekoslovakîya bi navûdeng Hanzelka û Sigmund û pirtûka Extera Mirovan (Planeta Lidi) ya František Kejik, ko tê de beşekî mezin li ser Kurdan bi navê Birayên min Kurd nivîsiye û tê de dibêje *'Eger ez ne Çek û ne Moravî bama minî xwestibana, ko ez Kurd bama'*. Wê rojê jineke zirav û dirêj, temenê wî li dor çilî bû, kete hundirê antîkvaryatê û yekser berê xwe da kasê. Tûrikek li milê wê bû. Tûrikê tijî pirtûk danî ber karmenda, ko li ser kasê kar dikir û got:

- Ev dîroka Sovyêtistanê ye, ew nema ji min re gerek e, ez dixwazim, heke bi arzanî be jî, ez wê bifiroşim.

Karmendê pirtûk bi rastî bi arzanî jê kirin. Lê hin kesên li wir bûn, firotina wan pirtûkan li xwe nexweş anîn û gotin, ko çawa bûye, tu hatiye dîroka Sovyêtistanê ji mala xwe derdixî û bi arzanî difiroşî. Di vir de guftûgoyeke germ destpêkir û em kesê li wir, em tev li dara wan kombûn û me ji xwe re li wan guhdarî kir. Jinikê bi zimanê



Zagrosê Hajo

xweyî çalak û dîtînen xweyî zelal zora hemûyên, ko serê xwe li ber rakirin bir, ew çû nav gelek mijaran, lê bi taybetî di pirsên dîrokî de zîrek bû. Piştî ko dawî li qerebalixê hat, ez çûme cem û min got:

- Ji kerema xwe tu dikarî şîretêkê li min bikî, da ez hin çavkaniyên dîrokî li ser Kurdan bibînim?

Wê bi dengêkî bilind û herkok got:

- Tu dixwazî li ser dîroka Kurdan ya kevn yan nû ya zanibî?

Ez mame matmayî, ji ber ko kêma xelkên Europa li ser Kurdan di wê demê de tiştin dizanîbûn, lê min bi lez got:

- Dîrka kevn.

Wê got:

- Here li dîroka Ermenistanê ya sedsalên deh û yazdehen binere, li wir gelek tişt li ser Kurdan hene!

Ez ji antîkvaryatê derketim û ketime pirtûkfiroşa li hemberî wê. Weke her pêncşemb rêzeke dirêj li pey hev bû û pirtûkên nû dikirin. Li Çekoslovakîya bûbû adet, ko pêncşemban pirtûkên nûweşandî li pirtûkfiroşan dihatine belakirin û xelk li pey hev dibûne rêz, da wan bikirin. Ez jî ketime rêzê de, da

ez pirtûkekê bikirim, lê min dehnê xwe dayê ko gelek ji yên li pêşiya min dibêjin Fraşka se zbranemî (Çek û Çiya), ya James Aldridge. Min dît ko gelek ji vê pirtûkê hatine kirin, êdî ew ji min re bû meraq û min jî hema got:

- Fraşka se zbranemî (Çek û Çiya) ya James Aldridge.

Li malê min dest bi xwendina pirtûkê kir, heylo ez çi bibînim, gava ko pirtûkek ji yên herî bi nêrx li ser Kurdan bi hunerekî wêjeyî payebilind hatiye nivîsandin, li ber min e. Ji wê rojê pê de min gelekî xwest ko her tiştî li ser nivîskarê wê bizanibim. Piştê min pirtûkeke, giranbuhatir, ya James Aldridge bi navê Diplomant jî bi destxist û xwend, êdî nivîskar hê di çavê min de mezintir bû. Diplomant pirtûkeke ji gewdê mezin e, naveroka wê li ser diplomasiya piştî Cenga Cîhanê din nav Inglîstan û Yekîtiya Sovyêti de li ser kêşeya Komara Kurdistan û Azerbêcanê ye. Welatên Rojava digotin, ko tiliha Sovyêtan di avakirina van herdû komaran de heye, lê wan jî ev tişt didane mandelayê û digotin, na gelê Kurd û Azer bi xwe biryara damezrandina dewletên xwe yên neteweyî dane. Bûyerên pirtûkê bi awayekî hunerî herî bilind hatine hûnandin û mirov hin caran goman dike, ko ew belgeyeke dîrokî dixwêne û dibe şahidê afirandina kêlikine aloz ji dîroka gelê Kurd.

Gelek sal derbas bûn, ez vegeram welêt û li wir bicihbûm. Rojekê Rezo telefon ji min re vekir û got:

- Dibêjin ko James Aldridge bûye mêhvanê Mihrecana Sînemayî li Şamê û Bavê Nazê hêvîdike, ko tu û filankes pê re bi navê Komela Kawa ya Rewşenbîrên Kurd herine pêşiya wî. Ma tu çi dibêji?

Min bi rastî di xewnan de jî goman nedikir, ko ezê carekê pêrgî vî camêrê hevqasî bi kûrayî û nazikî li ser pîrsa

Kurdan nivîsiye û kul û derdên Kurdan naskirine. Ew ji min re ne weke mirovekî bi goşt hestû xwiya dikir, lê ew li ber çavê min weke kesekê afsaneyî bû. Min yek nekire dido û got:

- Erê, ezê bi wan re herim.

Navê hevalê me yê sisiyn weke filankes ez dibêjim, ji ber ko ez rêzê li daxwaza wî digirim, da navê wî neyê naskirin. Hevalê me komunîst bû û wî nedixwest, ko hevalên wî yên komunîst zanibin, va ye ew xwe tevî pîrsên Kurdan dike. Komunîstên kurd wilo têgehiştibûn, ko kurdayetî pirseke nijadperestî ye û dive ew li dijî wê bin.

Em hersê bi hev ketin û me berê xwe da Şama şerîf. Weke gelek karê me Kurdan çûna me ne birêkûpêk bû. Me nizanîbû, ka James Aldridge kengî digehe Şamê, ewê li kû bi cih bibe, emê kengî, li kû û çilo wî bibînin? Lê me



bîra gelek tiştên giring jî dibir:

- Me dizanîbû ko dive em bixêrhatineke wilo mezin jê re bikin, da ew bizanibe, ko ew di çavê Kuran de gelekî giranbiha ye û Kurd ji ber hilwest û hestên wî derbarê Kurd û pîrsa wan, têkoşîn û hilwest û hestên piştgîriyê, yên lehengên pirtûkên wî, pîr spîsîdar e û nameyeke spasîyê bi navê Komele Kawa di vî warî de jê re pêşkêş bikin.

- Emê jê bixwazin, ko navê herdû navdarên kurd Cegerxwîn û Yilmaz

Guney pêşkêşî Komîta Xalata Lenîn ya Aştiyê bike, herwekî ew bi xwe jî endamê wê komîteyê bû.

- Dive ko em li ber xwe bidin, da hijmareke mezin ji rêxistinê kurdistanî navê xwe di bin pêşniyaza dana Xelata Aştiyê bo Cegerxwîn û Yilmaz Guney binivîse.

- Dive ko em hijmareke, ta bi dest me ve were, mezin bênine cem hev, da bi hev re werine bixêrhatina wî û da wî nasbikin û ew jî pirsê gelê kurd jê re şirove bikin.

Li Şamê em li hotêlake ji pileya navîn bi cih bûn. Hotêl di nîvê bajêr de bû û vê karê gera me hesanîtir dikir. Me dest bi gereke sistematîk kir. Ji ber ko Aldridge mêhvanê mehrecana sînemayî bû, em çûne dora sînemayên mezin bi hêviya ko em şopekê bibînin, lê ti nîşaneke ko alîkariya me bike me nedît. Kurd dibêjin '*Bi pîrsê, digehê Xursê*', me jî di vir re di wir re pîrsî û me naskir, ko James Aldridge li hotêla Al Şam dimêne, lê niha ew ne li Şamê ye. Ew çûye darî kaviîlên bajarê dîrokî Tedmirê yê li çolistana sûrî û ew sibe divegere. Em mane bendewarê roja din. Roj li nîvro me telefon ji hotêla wî re vekir; ji ber ko min bi zimanê inglîzî hinekî ji hevalên xwe baştir dizanîbû, êdî ez bi karmendên hotêlê re diaxivîm. Çend caran min telefon divekir û dipîrsî, ma ez dikarim bi birêz Aldridge re bipeyivim. Li vir min tiştekî balkêş ji bersiva karmendan dibihîst. Ew her car pêşî bi fransî diaxivîn û li zimanên din nedibûne xwedî, êdî min bi çavê xwe dît, ko wilo bi hesanî gelê dagirkirî nikarin xwe ji zimanê dagirkeran rizgar bikin. Ev bûbû 37 sal ko Sûriya ji bin destê Fransiyayê azad bûbû û di dibistanan de zimanê inglîzî piştî yê erebî tê xwendin û partiya Baasî nijadperest jî ji destpêka salên şestî ve desthilatdar e, lê hêj ewên dixwazin xwe bilind bibînin, serê xwe bi zimanê

fransî bilind dikin. Dawî ez bi Aldridge re peyivîm û me civan li hotêla wî jê stand, lê ji ber ko me kêsîmê hev nas nedikirin, me nizanîbû emê çawa bi ser hev ve bibin, rabû me ew bi hêviya guhleptika xwe ve hişt. Em zû çûne ser civanê xwe û bi çavên li bendê man. Wext hat, em rabûne ser xwe û me li dora xwe meyzand. Me dît ji nêrdewanê ve mirovekî navser, nêzîkî 60 salî, ne kin û ne dirêj bi bedlekî şîn ber me ve hat, em jî bi ber ve çûn û weke ko me berê hevdû nas dikir, me silav li hev kir û me jê re got, em kî ne û me bi dilgermî bixêrhatina wî kir. Em li cihekî rûniştin û yekser gotin hatine ser pîrsa kurdî û aloziyên wê û têkiliya Aldridge pê re. Wî hişkere kir, ko di rastiye de wî kêma Kurd bi xwe nas kirine, lê dema ko ew Kurdan dibîne, ew zû bi kul û derdên wan dihesa. Wî got, ko mîr Kamîran Bedirxan carnan belavok û brojûrên li ser Kurdan jê re dişiyandin, lê basa ti kesên din nekir. Û ew hinekî matmayî mabû ji ber vê hatina me û dipîrsî: Win komeleke kultûrî ne, ne siyasî ne? Axaftina me zû gehe dawiyê, me jê re got, ko komeke nûnerê partiyên kurdistanî yê siyasî jî hene, dixwazin wî bibînin û wî bi kebanîya wî re vedixwênine hevdîtinekê. Tevlî ko wî dizanîbû, ko em bi awakî nehîni li vir in û dibe ko ev bi mêhvarê wî re, ko serokê sûrî bû, dilsariyekê çêbike, wî bi dilxweşî qîma xwe anî, me xatir ji hev xwest û çûn.

Ji ber ko me beşek ji erkê xwe pêk anîbû, em gelekî dilşad bûbûn. Lê beşekî din ketibû nav astengiyan de. Hê nû ko em gehane Şamê, me xwe gehande nûnerên partiyên kurdistanî û me sedema hatina xwe ji wan re rave kir û daxwaza pişgirtina pêşniyazên xwe li ser Cegerxwîn û Yilmaz Guney li wan kir. Eger ez li vir hûr û kûr li ser bertekî û rengê danûstandinê bi vê

daxwazê re şirove bikim, ewê gelek pelên spî reş bike. Bi kurtî, eger xwendevan mozayîka bê harmonî û bi hev re nekokkirî, ya hêzên siyasî, ko îro Kurdistan pê neqîşandî ye, bêne ber çavê xwe, hingî wê nêzîkiyê li rewşa wê dema me bike. Hinekan gotin, ji ber navê Yilmaz destê me li dilê me ye, hinekan gotin ,ko Cegerxwîn endamê filan partiya girêdayî bêhvan cihî ye, hinekan gotin filan û bêhvan partî muhra xwe li ser *kaxetkên* we deynin, emê ya xwe rakir. Ne tenê wilo partiyeke gewre, ne tenê navê xwe rakir, lê bi xwe re du partiye din jî kişandin û *kaxetkên* me muhr nekirin. Lê tevî van hemû xirûciran jî çardeh partiye kurdistanî pêşniyazên me pejirandin û muhrkirin.

Piştê hinek xirûcir li ser cihê hevdîtina Aldridge de jî derketine meydanê. Dostekî me jî Kurdên şamî got, ko werine mala me û bere diya min çend xwarinên kurdî jê re çêbike. Diya wî pîreke kurdî dilovan û xwînşêrîn bû, mala wî li dehma tarika kurdî ya li Şamê bû û odên wî bi taximên rûniştinê yên kurdî raxistî bûn. Ew taxim tiştêkî antîk bû, tev bi mozayîka Kurdên şamî, ya bi navûdeng neqîşandî bû. Me pêşniyaza wî baş û durist dît, lê hêzên siyasî, yên me gotin, ko na, ew hevalê we ye, ji ber vê win dixwazin Aldridge bibine mala hevalê xwe û propagandê ji partiya xwe re çêbikin. Êdî me dev ji wê berda û me camêr vexwende cihekî li bajêr.

Her tişt êdî me ber bi hev de anî bû, wergerandina pêşniyaz û gotinên spasdarî û bixêrhatinê bi zimanê inglîzî, piştgirî û amadebûna partiye kurdistanî jî bûbû rastiyeke. Lê me dît, ko em hemû mîr in û ti jin di nav me de nînin û ev jî dikare nîşaneke şaş bide mîhvanê me yî şêrîn. Em mane heyirî, lê dostê me yê, ko dixwest mala xwe ji me re terxan bike, çû û endameke

partiya xwe anî, ew xwendevana zanîngehê bû, û ev bû cihê dilrehetiya me, niha me karî bû em rûyê xwe li ber mîhvanê xwe spî bikin.

Roja hevdîtînê, partiye kurdistanî ji bakur, başûr û rojavayê welatê me li hev gehane hev, di wê demê de ji rojhilatê Kurdistanê ti partiye siyasî li Şamê nediman. Piştî ko hemû li hev civîn, Bavê Nazê dest bi axaftinê kir, bixêrhatineke li gor qedr û qîmetê James Aldridge kir, nameyên spasdarî û pêşniyazan danê û li ser wan axivî dawî got, ko dema em Kurd çîroka Çek û Çiya dixwênim, tê ber çavê me ko tu bi xwe lehengê çîrkê MacGregor î û kebanîya te jî Katya ye. Kebanîya wî Dana bi lez ji cihê xwe got:

- Na, ez jî MacGregor im.

Di çîrokê de Katya nedixwest, ko mîrê MacGregor xwe tevî teşqelên Kurdan bike. Vê gotina piştgiriye Dana Aldridge dilê min gelekî xweş kir. Piştê Bavê Nazê wergera xwe ya pirtûka Çek û Çiya da Aldridge, tevî ko Aldridge destûra wergerandinê nedabû jî, lê ew pê şah bû.

Li wir her kesî dîtînen xwe û dîtînen rêxistinên xwe li ser pîrsa kurdî û çara wê gotin. Tiştê bala min dikîşand hijmara bêpîvan, ya pîrsên Aldridge bû. Xwiya dikir jî, ko rabûna lehiya olperestiya serhişk li herêmê, ew nereht dikirin. Wî got jî, ko hê planên wî hene, da pîrsa kurdî bike mijara berhemên xweyî wêjeyî yên nû.

Dem hat ko tev herin, êdî her yek rabû xatir jê xwest û çû, çaxê divabû, ko em jî herin wî adresa xwe da min û weke, ko Kurd dibêjin, wî got:

Çi wextê tu werî London, mala min mala te ye.

Bernameya James Aldridge bi gelek derên din ve, bi serokê sûrî ve, bi rojname û televîzyon û mehrecanê ve girêdayî bû û me hew dikarî bû careke din hevdû bibînin.

JAMES ALDRIDGE

Û BERHEMÊN WÎ

JACK LINDSAY

Wergêr Zagrosê Hajo

James Harold Edward Aldridge li Ausrtalya, li White Hills, Vic-toria, 10ê hezîrana sala 1918an hatiye ser rûyê dinyayê. Perwerdebûna wî li Swan Hill High School û li Londonê li School of Economics bû. Dina Mitchnik sala 1942 ji xwe re anî û Xwedê du kur dane wan. Li Melbourne di *Herald û Sun* de ji salên 1937 û 1938 dini-vîsand û li Londonê sala 1939 di *Daily Sketch* û *Sunday Dispatch* de jî dinivîsand. Ji Aus-tralian Newspaper Service re di salên 1939-44 de Li Ewropa û li Rojhilata Nêzik nûçeguhêzê cengê bû û sala 1944 li Tehranê nûçeguhêzê *Time* û *Life* bû.


Xelatên ko wergirtine:

- Xelata Bîranîna Rhys (Rhys Memorial) sala 1945an
- Medalya zêr ya Encûmena Aşîtiya Cihanî (World Peace Council)
- Xelata Rêxistina Navneteweyî ya Rojnamevanan (International Organization of Journalists) sala 1967an
- Xelata Aşîtiyê ya Bîranîna Lenîn (Lenin Memorial Peace Prize) sala 1972an
- Xelata Encûmena Pirtûka Zarokên Australî ya Pirtûka Salê (Australian Children's Book Council Book of the Year award) sala 1985an
- Xelata *Guardian* ya pirtûkên zarokan sala 1987an

WEŞANÊN JAMES ALDRIDGE:

Çîrok:

- *Signed with Their Honour* (Bi Rûmeta Wan Muhirkirî). London, Joseph, and Boston, Little Brown, 1942.
- *The Sea Eagle* (Hûliyê Deryayî). London, Joseph, and Boston, Little Brown, 1944.
- *Of Many Men* (Ji nav Gelek Mêran). London, Joseph, and Boston, Little Brown, 1946.
- *The Diplomat* (Diplomat). London, Lane, 1949; Boston, Little Brown, 1950.
- *The Hunter* (Nêçîrvan). London, Lane, 1950; Boston, Little Brown, 1951.



- *Heroes of the Empty View* (Lehengê Dîtina Vala). London, Lane, New York, Knopf, 1954.
- *I Wish He Would Not Die* (Xwezî Ew Nemiribana). London, Bodley Head, 1957; New York, Doubleday, 1958.
- *The Last Exile* (Sergona Dawî). London, Hamish Hamilton, New York, Doubleday, 1961.
- *A Captive in the Land* (Dîlek li Welêt). London, Hamish Hamilton 1962; New York, Doubleday, 1963. *The Statesman's Game* (Leystika Keyayên Dewletê). London, Hamish Hamilton 1962; New York, Doubleday, 1966
- *My Brother Tom* (Birayê Min Tom). London, Hamish Hamilton 1966; weke *My Brother Tom: A Love Story* (Çîrokeke Evînê), Boston, Little Brown, 1967.
- *A Sporting Proposition* (Pêşniyareke Werzeşî). London, Joseph, Boston, Little Brown, 1973; weke *Wild Pony* (Poniyê Kovî), London, Penguin, 1976.
- *Mockery in Arms* (Pêkenîn Di Destdariyê de). London, Joseph, 1974; Boston, Little Brown, 1975.
- *The Untouchable Juli* (Juliya Nehingavtî). London, Joseph, 1975; Boston, Little Brown, 1976.
- *One Last Glimpse* (Awireke Dawî). London, Joseph, 1975; Boston, Little Brown, 1977.

Goodbye Un-America (Ji Amerîrkayekê re Oxir Be). London, Joseph, Boston, Little Brown, 1979.

Çîrokên Kurt

Gold and Sand (Zêr û Qûm). London, Bodley Head, 1960

Çîrokên kurtî necivandî

- "Braver Time" (Dema Mêrtir) di *Redbook* (Pirtûka Sor) de (New York), Gulana 1967.
- "The Unfinished Soldiers" (Lêşkerên Neamadekirî) di *Winter's Toles* (Çîrokên Zistanî) de 15 çîrok, A.D.Maclean. London, Macmillan, 1969; New York, St.Martin's Press, 1977.

"The Black Ghost of St.Helen" (Cinê Reş yê St. Helen) di *After Midnight Ghost Book* (Pirtûka Cinê Piştî Nîvê Şevê) de, James Hale, London, Hutchinson, 1980.

Leystikên Şanoyî

- *The 49th State* (Dewleta 49an), London, 1947.
- *One Last Glimpse* (Awireke Dawî), Prag 1981.

Leystikên televizyonî

Nivîsandina sînyaroya xelekên leystika *Robin Hood*

Berhemên din

- *Undersea Hunting for Inexperim-ced Emenglishman* (Inglîzekî Nepi-spor di Nêçîra Bin Avê de). London, Allen û Unwin, 1955.
- *The Flying 19* (Firîna 19) ji zarokan re. London, Hamish Hamilton, 1966.
- *Living Egypt* (Misra Jîndar), wêne ji aliyê Paul Stand ve hatine girtin. London, MacGibbon û Kee, New York, Horizon Press, 1969.

- *Cairo* (Qahîre): *Biography of a city* (Jiyana Bajarekî). Boston, Little Brown, 1969; London, Macmillan, 1970.
- *The Marvelous Mongolian* (Mongoliyê Hêj) ji zarokan re. Boston, Little Brown û London, Macmillan, 1974.
- *The Broken Saddle* (Kurtanê Dirandî) ji zarokan re. London, MacRae, 1982; New York, Watts, 1983.
- *The True Story of Lilli Stubek* (Çîroka Rastî ya Lillî Stubek) ji zarokan re. South Yarra, Victoria, Hyland House, 1984; London, Penguin, 1986.

Lêkolînên rexnegîrî:

- *The Necessity of Freedom* (Pêwistiya Azadiyê): Lêkolîn li ser çîrokên James Aldridge, di *Overland* de, Melbourne, mijdara 1956an.
- *It All Comes Out Like Blood* (Her Tişt Weke Xwînê Derdiçe): Çîrokên James Aldridge, di *Australians* de, bi destê John Hetherington, Melbourne, Cheshire, 1960.
- *Man of Action, Words in Action* (Mêrê Çalakiyê, Gotinên di Çalakiyê de): bi destê Eric Partridge, di *Meanjin*, Melbourne, 1961.
- *The Heroic Ordinary* (Asayiya leheng): bi destê Evelyn Juers, di *Age Monthly Review* de, Melbourne, sibata 1987an.
- *Workers and Suffers* (Karker û Kul): *Self in James Aldridge's St. Helen Novels* (Xwe di çîrokên St. Helen yê James Aldridge de), London, Australians Studies Centre (Navenda Lêkolînên Australî), 1987.
- *My Brother Tom* (Birayê Min Tom): *My Other Self* (Xweya Minî Din), di Orana (Sydney) de, sibat 1989, bi destê Michael Stone.

Dema James Aldridge weke nûçevanê cengî ji Australya derket, ew hê gelekî ciwan bû, û vê rastiye jî bi kûrayî şûna xwe di rengê nêzîkbûna wî de, ya ber bi pirsên ko li ser kardikir de, hişt. Wî têkoşîna Yûnaniyan dît û wî du pirtûk nivîsandin. Bingeha herdû pirtûkan yekser li ser ezmûnên wî ji wê têkoşînê dirûniştin. Li vir metodên wî bi giranî di bin bandora Hemingway de bûn, lê ew pirtûk bi tazebûna xweyî jîr ve û bi dilsoziya pêşkêşkirinê ve, ew dûrî hema zalîkirinê (imitation) bûn. Ew hîn dibû çawa çîrokên bi bûyeran dixijmijîn ava bike, hîmê çîrokan didanî ser pêşveçûnên dirokî, yê ko wî bi xwe berî her tiştî baş nasdikirin, û di heman wext de wî çîrok bi kêşeyên kesane ve û bi têkoşîna lehengên xwe ve girê dida. Di pirtûka di pey re de, ya ji komeke çîrokan bû, bandora Hemingway şikest. Tiştê ko ew ji xwendina xwe hîn bûbû êdî bi metodên wî re û bi dîtîna wî re hatibû stirihandin. Çîrokan dane xwiyakirin bê çawa ew dikare hevsarê bûyerên aloz û pirtexlît bi hostayî bi dest xwe bigire û bi awayekî ewle dûrdîtîna ji rengê xisletên neteweyî di formeke hevgirtî de, bide nasandin. Wî ji kehniya pisporiya xwe ya ji dema şer ve, çaxê ko ew nûçevanê cengî bû, kişand û wî Diplomat (The diplomat) nivîsand. Diplomat karekî azwer e, ji radeya bilind e, ew Yekîtiya Sovyêtê û herêma Kurdistan li bakurê

Mezopotamyayê dide ber xwe. Ew bi hostayiyeke mezin dikeve nav cîhana diplomasiya têkel û li hev herbilî, ya dinyaya piştî cengê de. Ew mijarên ko bingehên wan di pirsê Kurdanî neteweyî, ya çetin de ne, heyber dike. Aldridge weke çîroknivîsekî siyasiyî giring derdikeve meydanê. Wî xwe hişkere kir, ko ew dikare li ser mijarên siyasî, yê aloz kar bike, bêtî ko hingavtina pirsên mirovî, yê hîmî wînda bike. Girêdana têkoşîna bi kul ya lehengên, ko dixwestin cîhana, ko xwe tê de weke leystikvan dîtîbûn, nasbikin; hiştîbû ko kûrdîtinên siyasî di Diplomat de ji tengkirina arzan dûtî bibin. Bi vê yekê tiştê ko bihayê hun rî da vî karî, li derveyî hemû encamên taybetî, bi gera li rastiye ve girêdayî bû, ew danasîna wê gerê bi xwe bû.


Di Nêçîrvan (The hunter) de, Aldridge bi devjêberdana mijarên mezin xwe dîse nû dike, û di karekî ko yekser bi ezmûnan ve girêdayî ye, diçe Kanadayê. Mijara wî vê carê cîhana nêçîrvên bû, pêwendiyêke rûbirû bi xweristê re bû, û di vî karê wêjeyî de wî şanî me da, ko ew dikare jiyana fîzîkî ya xurû bêne ber çavan û bi gewd bike.

Lêbelê dibe balkêş be, ko dema wî berê xwe ji cîhana xweristê guhert, wî ne li jiyana rojane ya di civakeke taybetî de meyzand. Her çilo be, cengê ew stiriha û ew kire romannivîsê kêşeyên neteweyî, yê mezin, yê heyama me. Helbet babetên wî ji rojnamevaniya wî zan, lê di guhartina ko babet dibe xeyal de, ew ji rojnamevaniya sînoard bihûrtîbû û wî karîbû derbas bibe nav kûraniya pirsên mirovaniyê. Ew li kêşeyan bi gotinên mirovê, ko bi rastî hene dinere û ew ji binî bê guneh e, eger wî totikin bi xeyalê xwe çêkiribin, da nûneriya hilwestên neteweyî û siyasî bikin.

Ew careke din berê xwe dide Rojhilata Nêzik, di Heroes of the empty View (Lehengê Dîtina Vala) de, di I Wish He Would Not Die (Xwezî Ew Nemiribana) de, û di The Last Exile (Sergona Dawî) de, ew danûstandinê ne bi pirsê wilo dûtî re weke pirsê Kurdan dike, lê ew bi problema cîhana erebî re dike, ji çavkehiya taybetî ji Misirê diwêrive. Geklek tîkelîyên rûbirû û çavkehiyên agahdariyan alîkariya wî kiribûn, lê tevî simpatiya wî bi Ereban re, wî ne pirs yekalî dikirin, ne jî karê xwe dikire çerxa dîtînin taybetî de. Çîrokan tişt zelal dikirin û tîgehiştina mirov li ser ademîzadê ko ketiye nav xirûcirên mezin de bêhtir dikirin. Di karên wî yê dawî de, ew dîse pirsên li ser Sovyêtistanê bilind dike, lêbelê ne bi wê hêz û serketina hunerî ya di Diplomat de, yan jî ya di pirtûkên li der Rojhilata Nêzik de. Ewê zor be ko mirov bikaribe tiliha xwe bi romannivîsekî hevdem ve bike, yê ko bêhtir rûbirû bi kêşeyên siyasî yê paş cengê ve di qada navneteweyî de bi serfirazî mjûlbûbin, simpatiyêke germ ji bo kesên wî li ser wan nivîsiye, daye hev, bi, di berxwedana dawî de, xatirxwestîneke bi rastî hunermendî bû.

Irfan di mem û zîn_a

EHMEDÊ XANÎ DE



Perwîz Cîhanî

Umêd ew e ji ehlê 'irfan
ew dê nekirin li me çu 'herfan
Teşnî' nekin wekî 'xeyûran
İslah bikin me qusûran

Nasandina Ehmedê Xanî û şahkara wî
Mem û Zîn ne karê rojek û du rojan e û
bi gotaran kes neşê Mem û Zîna Xanî,
bîr û hizra bilinde Xanî di gel tewawî
taybetmendiyên wê şirove bike. Ji vî
karî re nivîsîna çend pirtûkan pêdivî ye,
lê:

"Çi bikim ko qevî kesad e bazar
Nîn in ji qumaş ra xerîdar"

* Ev gotara ko nuha ez pêşkêşî we
dikim dilopek ji deryayê ye. Gotar li du
pişkan serrast bûye. Pişka yekê
nasandina Ehmedê Xanî û şûnewarên
wî ye. Pişka duyê nêhêrînek li şûn û
şopên felsefe û irfanê li Mem û Zîn a
Xanî de ye. Hêvidar im li ser gotina
gorbihîşt Cigerxwîn:

"Dixwazim biborî di kêmasiyan
li çolê gihame ne Walansiyan."

* Hêja ye ko em Ehmedê Xanî tava
ronake toreyî kurdî bi navê rêveberê
gelê kurdî bi navê rêveberê gelê kurd bi
nav bikin. Çima? Lewra ko Xanî Baba

weke rêveberê dilsoj û agah li xema
gel û welatê xwe daye. Ew wekî
rêveberê zana, mamosteyekî dilşewitî
dixwaze gişt zanistên gûna (dewrana)
xwe li rêka pirtûkên xwe de ferî gelê
Kurd bike... Eger em hûr û kûr dîna
xwe bidin şûnewarên wî, dê, ji me re
rojîn û êşkere bibe ko mebesta wî li
wan şûnewaran tenê vehûnana
helbestek evîndariyê, yan çîrokek sade
nîne. Ew dixwaze li rêka helbest û
çîrokê, gelê xwe hişyar bike û zanistên
cur bi cur raberî xwendevanên pirtûkên
xwe bike. Pirtûka wî ya eqîda Îmanê rê
û şûna ayînî û xîm û binêşeyên
baweriya îslamê raberî xwendevanan
dike. Yekemîn ferhenga zimanê kurdî
yanê ferhenga Nûbihar tenê ferhengê
sade nîne. Xanî digel wê hindê ko
xwestiye xwendekarên kurd digel
peyvên cur bi cure kurdî û erebî nasiyar
bike, ewana digel zanista erûz û qafiye
û kêşa helbestan û behrên erûzî ji
xwendekaran re şirove dike, ko eva
karekî bêheval e.

* Gava ko em Mem û Zîna Xanî Baba
dixwînin em dibînin Mem û Zîn ko
piştî şûnewarên Feqiyê Teyran yekemîn
çîroka helbestî ye di nav toreyî klasîka
kurdî de, tenê çîrok û serhatiyek sade
ye evîndariyê nîne, belkû deryayeke li
zanistên cur bi cur yên weke: felsefe,
irfan, xwedênasî û ayîndarî, komelnasî,
stêrnasî, sazbandî, ciwankariyên toreyî,

çîroknivîsî, deb û rismên cur bi cure kurdî, deb û rismên weke: Cejna sersalê, nêçîr û nêçîrgeh bawerî bi falvegirtinê, çawaniya keça kurd di komela kurdewarî de, rê û rismên jin înan û zava û birazava û bûkguhastinê, şîn û şîngêrî, biratî û mercên biratiyê, dîwanxana kurdî û çawaniya mîratiya kurdî û bê desthilatdarî û sadetiya mîrên kurd ko bi xeber û gotina xebergerînekî wek Bekirok çavê wane besîretê kore dibe û li kar û barên xwe de kûrbîn û dûrbîn nebûne û nînin. Û çendîn zanist û hunerên dî di vê pirtûkê de bi curekî rêk û pêk wek mîrvariyên pêvekîrî rêz bûne.

* Li bara ziman û ciwankariyên toreyî de heta roja îro çî kes li hozanên kurd negehiştine toza reşbozê Xanî. Xanî çî peyvekê di helbestên xwe de bêçine nade xebatê. Ji bo nimûne eger em hema yekimîn beyta pirtûka Mem û Zînê bidin ber hûrbîniya ciwankariyê, emê bibînin ko Xanî çawa bi hostanî ciwankariyên toreyê di vê beytê de xebintadiye, Xanî dibêje:

"Sernameyê name namê Ellah

Bê namê te natemam Wellah"



Li bara ciwankariyên toreyî yanê *senetên bedî*" de, peyvên sername û name pêkve *cinasa zayîda mutteref* serrast dike, name digel nam *zayîda muzeyyê*, di nîveka her çar naman di herdu misraan de seneta *tekrîrê* serrast bûye. Ellah û Wellah jî dîsan pêkve cinasê serrast dîkin. Her weha ev beyta Tehlîl yan lêkdaneveya hedîsek nebewî ye jî, yan di van beytên xwarê de ko îmaj û teswîrên xeyaliye zor ciwan înaye û awa behsa hilatina tavê dike:

"Damanê 'erûsê pakê gerdûn

Damad ku kir bi mêhrê gulgûn

Tarîfî bi rohnîyê ku rakir

Xem şubhetî zulmetê fena kir"

Yan di van beytên xwarê de ko dîsa behsê hilatina tavê dike. Bibînin ko îmajên çende ciwan afirandiye:

"Sersub'he ku şehsewarê esleq

eşheb ku kişande cayê ebleq

Edhem di tewîleyê nehîn kir

Eşheb ji xwe ra jî nû ve zîn kir

Gurzê xwe yî atêşîn deranî

tî'xê xwe yî zerfeşan ku danî

Dunya ji mehabeta xwe zer kir

Tî'x û kemera çîyan bi 'ker kir"

Negotî nemîne ji bilî teswîrsazî û îmajê, ji vê senetê re Beraetê îstihlal jî dibêjin, ko curek fesaziye bo wê hindê ko xwendevan pêsta seha serhat û qewmînê bikin. Lê ta cîhê ko ez dizanim ta roja îro kesî ev layê hunerî di Mem û Zîna Xanî de nedaye berçavan û kesek jî li ser vê hindê nexebitiye, da ko roşin be ko Xanî di vî hunerî de çî kiriye û rastî hema 'Elema kelamê mewzûn, gihandiye banê gerdûn û li ber perê asîmanan jî derbas kiriye.

* Gelek nivîskar û tuwêjkarê me gotine û dibêjin ko Ehmedê Xanî gelek peyv û goteyên erebî û farisî di Mem û Zînê de xebitandiye ko ji Kurdan re nenasiyar in!...Rast e!! Lê du egerên binêşeyiye vê yekê hene. Yek ew e ko di gûna Xanî de xebitandina peyvên giran di

nivîsîn û axiftinê de huner dihate jimartin. Kesê ko gelek ew cure peyvane bida xebatê, serketî dihate zanîn. Lê egera duyê ko egera binêseyî û zor girîng e, eve ye ko, Xanî Baba li Mem û Zînê de ji Kurdan re felsefe û irfan nivîsiye. Zimanê felsefe û irfanê ji zimanekî taybet e. Têm û îdyom û îstilahatên wa di irfan û felsefê de hene ko ne tenê di zimanê kurdî de, ew zaravayane peyda nabin û tunene, belkû di tewawî zimanê rojhilata navîn de ji bil erebî li çî zimanên diyê navçê de tunene. Peyv û gotinên weke: Îmkan, wacibulwucûd, wucûb, mewalid, enasir, masewa, xelq, emr, nasût, lahût, eşbah, şehadet, xeyb, zahir, batin, cewher, erez, hiyûlî (heyûla), hadis, qedîm, ebed, ezel û çendîn peyv û îdyomên dî. Îca Xanî Baba neçar bûye ko ji van peyvana wêc û kelkê werbigre.

Vêca em bên li ser felsefê û irfanê di Mem û Zîna Xanî Baba de:

Em bi xwendina Mem û Zînê pê dihesin ko Xanî zanista felsefê baş zaniye û di vê zanistê de melevanekî bêheval û somekarekî bêbevl e. Lê Xanî filosof nîne, Xanê arif e. Ya baş ew e pêş wê hindê de ko em dakevin kûraniya gotarê, em bizanin kanê irfan û felsefe çî ye û arif û filosof kîjan e?

arif û filosof herduk jî li dû peydakirina heqîqet û rastiye de ne, herduk li heqîqetê digerîn. Lê cudayiya wan li çawaniya belgevehênan û şîweyta peydakirina rastiye de ye. Filosof dixwaze bi rêka hiş û jîrbûna xwe û belgevehinana mentiqî rastiye peyda bike, lê arif dixwaze li rêka evîn û evîndariye rastiye peydabike û bighîje heqîqetê.

Amraza nasîn û peydakirin heqîqetê di felsefê de hiş û belgevehênan e: Lê di irfanê de evîn e. arif evîndarê tecelaya nûra Xwedê ye û dixwaze di vê rêkê de bighîje Xwedê, lê filosof kemala

mirovaniye di wê hindê de dibîne ko hemû tiştî li rêka aqil û zanistê dest xwe ve bîne, lê arif hêvîdar e ko pê fenaya xwe di heq de bekaya ebedî, yanî manewa herehereyî dest xwe ve bîne û weke dilopekî bighîje deryayê û di gel deryayê bibe yek. Em evê hindê di serbihuriya Mem û Zînê de dibînin. Evîn û evîndarî di rêbaza irfanê de binêşe ye. Evîn sermaya herehereyî û kaniya ava heyatê ye ji arif re. Maşûqa arifan Xwedê ye, aşiq gerek e di vê rêkê de dest ji dinyayê û tewanî tiştên wê ye nefsani ve cismanî bikişîne, ta bigihîjin Xwedê. Dilê arif cihê tirişkanewe û çilvilîna nûr û ronahiya Xwedê ye, ewe ye ko pişka zor e arifan çirok û serhatiyên irfanî û evîndariye yan helbestên evîndariye nivîsîne. Ehmedê Xanî jî yek ji wan arifan e ko hem bi xwe evîndar bûye hem jî ji çiroka evîndariye bi şeweyek irfanî afirandiye. Xanî li bara evîna xwe de dibêje:

” Saqî mi bigir ko ez bidest im
Mexmûr im û meynexwarî mest im

Gava ko vexwar Memê û Zînê
Axift li min cihê birînê

Em ‘aşiq eger çî meyperest in
Emma ji meya Elestê mest in

Ew mey ne wekî meya te al e

Ew mey ji cemala Zulcelal e

Ew hubba ‘hebîba pakzat e

Qinwanê ‘hedîqeyê sîfat e

Saqî bide min jî boy Xwedê ra

Camek ji meya te duh digêra”

Di van beytana de Xanî bi eşkeretî ko evîndar e, lê evîndarê cemal û ciwaniya Xwedê ye, hebîba wî ya pakzat Xwedê ye. Gorekî bîr û hizra arifan saqiya cama elestê Xwedê bi xwe ye. arif evê ayeta Quranê ko dibêje:

” We seqahum rebuhum şeraben
tehûren” awa şirovedikin û dibêjin:
Xwedê mirov ji meya giyan têrav kir û ji nebûnê anî hebûnê. Xanî jî durust evê hindê digerewe û dibêje:

Saqî ji boy Xwedê camek ji meya te duh yanê roja elestê digêra bide min jî.

"Her cur'eyekê ezê bikim 'tam yek neşie bese'heta serencam"

Me got ko pişka zor a arifan serhatiyên evîndarane yan helbestên evîndariyê nivîsîne, Xanî jî Mem û Zîn nivîsiye.

Lê tiştê ko ji hemûyê balrakêştir e, eve ye ko li nav serhatiyên evîndarane û irafanî de yên weke: Leyl û Mecnûn, Xusrev û Şîrîn, Wamiq û Ezra, Seleman û Ebsal, Weys û Ramîn, Samson û Delîle, Şêxê Senan, Yûsuf û Zuleyxa, Huma û Humayûn, Xurşîd û Xawer di nav wan hemûyan de Mem û Zîn xudane serratiyek (îmtiyaz) taybet e. Tewawî van çîrok û serhatiyên jorîn, tenê di destpêka çîrokê de bahsê pîrsa irfan û felsefe dikin, lê gava ko daketin gêraneweya çîrokê, tenê hunera wan çîrokbêjî yê, êdî irfan û felsefe ji bîra wan diçe, lê Xanî li dema gêraneweya çîrokê de jî irfanê ji bîr nake, di seranserê çîroka Mem û Zînê de Xanî wate û zaravayên irfanî dixebitîne û reng û rûyê irfanî dide tewawî pişkê wê û pîrsa irfanê li xir pişkan de li ber çavê wî ye, û çîrokê bi curekî irfanî kuta dike.

Ev yek e di gel berçavgirtina nenasiyariya zimanê kurdî di gel felsefe û irfanê û nebûna piştivaneyek mêjûyî ji toreya kurdî re rastî karekî yekcar dijwar e. He rastî Xanî şahkarek mezin afirandiye ko şitaqek (hiç yek) li wan çîrokên evîndarî û erfani nîkarin di gel vê şahkarê beranberiyê bikin. Xanî di serataya Mem û Zînê de awa arifane di eşqa Xwedê de dibêje û dibilîne:

"Ey mettle'ê 'husnê 'eşqbazî

Me'hbûbê 'heqîqî û mecazî

Me'sûq tu yî bi fexr û naz î

'Aşiq tu yî lîyêkî bê niyaz î"

Di van helbestana de Xanî dibêje ko Xwedê sereta û cihê helatin û higavtina cîwaniya evîndariyê ye, Xwedê mehbûba heqîqî û mecazî, yara zemînî

û asimanî ye, Xwedê hem aşiq e hem maşûq, lê Xwedê aşiqeqî bêhewce û niyaz e. Ev beyta Mem û Zînê îşare bi vê ayeta Qurana pîroz e ko dibêje:

"Fesewfe yeitiyellahê biqewmên yuhibuhum we yuhubûne" (ayeta 54 li sûreya 5 dike). Wate bi van zûyana Xwedêyê hoz yan desteyekî bîne ko hez ji wan bike û ewan jî hez ji wî bikin. Arifan di şîrovekirina vê ayetê de gotine: Her wisan ko beniyên Xwedê evîndarê Xwedê ne, Xwedê jî hez ji wan dike û evîndarê wan e. Lê hindekan di hember vê qiseyê de gotine ko evîndariya Xwedê ji beniyên xwe re curek hewcedarî ye, lê arif dibêjin peyva "hum" di vê ayetê de bi hesabê ebcêdê dibe (45) ko beranber e di gel jimara ebcêdiya Adem. Û her ew emaneta ko dibêjin Xwedê roja elestê daye mirovan, her evîna bûyê.

Xanî jî he ji ber vê hindê ye ko dibêje.

Xwedêyo!" Aşiq tu yî lîyêkî bêniyaz î"

Xanî di vê mesrê de evîndariya Xwedê û nehevewcedariya wî binecî dike û paşê dibêje:

"Mutleq tu mufid û mustefad î

Bêsubhe murîd û hem murad î

Nûr î tu di 'husnê rûyê dildar

Nar î tu di qelbê 'aşiqê jar

Şem' î ne ji qismê nûr û nar î

Şems î ne 'eyan tu perdedar î

Genc î tu di nêv tilismê 'alem

Kenz î tu 'eyan ji ismê Adem

Ev 'alem û ademê di meşhûd

Ev mumkin û masewayê mewcûd

Hemiyan bi te ye medare û debr

Feyyazê riyazê xelq wel emr"

Xanî di van beytana de bi ronahî dibêje ko Xwedê hem wêc û qazancê werdigre, hem qazancê distîne, hem mûrîd e, hem murad e, hem nûr û ronahiya ciwaniya rûyê dildarê ye û hem jî agirê evîndariyê ye di dilê aşiqê belengaz de. Xwedê yelmûma evînê ye, lê ne yelmûneke ko ji qism û new'ê agir û ronahiya cismanî be, Xwedê

tavek e, lê di pişt perdê de ye, Xwedê xezîneyek veşartî ye ko bi navê adem ev xezîneya veşartî derkete eşkeretiye. Lêre de Xanî îşare bi vê hedîsê dike:

"Kuntû kenzen mexfiyyen fe ehbebtû bi en u'refe fexeleqtûlxeqe likey u'refê"
Xwedê fermayîş kiriye: Ez xezîneyek veşartî bûm, min dixwest bême naskirin, lewra min cîhana cismanî û mirov afirand.

Xanî di van beytan de mesela wehdet di kisret û kisret di wehdetê de heldixe. Gorekî bîr û hizra arifan, Xwedê di hemû tiştê de heye û hemû tişt mezreh û nimûd û sîmbolek li hebûna Xwedê ye. Xanî li dû re dibêje:

"Ela lehuxelqû welemr tebarekellahû rebil'alemîne"



Xanî li du gotinên xwe ra digre û dibêje:

"Emrê te bi lefzê kun du 'alem Mewcûd kirin 'xerez çi? Adem Adem bi xwe yek ji herdûwan e Yek 'herf ji emrê kun fekane Ev 'herf 'heqîqetên mu'heqeq Hem emr e bi qudreta te hem xelq Eşba'h muresem in ji nasût"

Erwa'h muwesem in bi lahût
Ev rûh û cesed bi cebr û îkrah
Tezwîc bûyîn bi emrê Ellah
Nasûtî eger çi reng sefal e
Lahûtî ji pertewa cemal e

Xanî jî weke tewawî arifan li ser wê bîr û bawerê ye ko Xwedê giştî hebûnê seb xatirê Adem çekiriye. Xwedê cîhan bi gotina yek peyva bibe (kun) afirand ko Adem pîtek li wê peyvê ye. Mirov hem cîhana cismanî ye û hem jî cîhana rûhanî ye lewra, ruh yan giyan asimanî û laş jî zevînî ye. Xanî li beytên:

*"Eşba'h muressem in ji nasût
Erwa'h muwessem in bi lahût
Nasûtî eger çi reng sefal e
Lahûtî ji pertewa cemal e"*

Îşare bi musula Eflatûn (Plato 428-347 BZ), dike û dibêje:

Mirovên vê dunyayê jî weke êxsîrên şikefta ko Eflatûn nimûne hênaye, nikarin rastiya cîhanê bibînin, meger ko ewê zincîrê li piyê xwe vekin û ji şikefta vê cîhanê rizgar û aza bin. Xanî dibêje: Laş û tapo yanê şebêhê me (reşayiya me) di cîhana zevînî û cismanî de neqîşîye û rûh û giyanê me jî di cîhana rûhana rûhanî û asimanî de hatiye zincîr kirin. Cîhana nasûtî jêrîn e û cîhana lahûtî jî ronahî û pertewa cemala Xwedê ye. Xanî li dû gotinên xwe ra digre û di bara mezinayî û pileya here jore mirov de weha dibêje:

*"Herfa ko me gotî neqşê hûr e
Lê meqsed û me'niya wê kûr e
Zahir te eger numaye su'xra
Batin ewe neqşê xame kubra
Mewcûd e di wê şahadet û 'xeyb
Meşhûd e di wê seyadet û 'eyb
Însan bi xwe hem zelaye e hem nûr
Adem ji te hem qerîb e hem dûr"*

Xanî di pey gotinên xwe yê pêş de digre û dibêje:

Ew pîta ko me gotî neqşek hûrik û biçûk e, lê amanc û mebest û wateya wê mezin û kûr e. Mebest li wê herf

yan pîtê Adem e ko Xanî dibêje ” Yek herf ji emrê kunfekane...”

Wate Xwedêyo eger te mirov rû ve biçûk nîşan daye, lê di binêşê de ew mezin e, lewra ko neqşê qelema kibriyayî ye. Mewlewî arifê mezine îranî dibêje:

”Pes bi sûret ‘alemê es’xer tu yî

Pes bi me’nî ‘alemê ekber tu yî”

Eger rû ve tu cîjhanek biçûk î lê wate û me’niyê de tu cîjhanek mezin î. Xanî jî dibêje:

”Zahir te eger numaye su’xra

Batin ewe neqşê xame kubra”

Lewra ko mirov ji du tiştên dijî hev hatiye afirandin: Ronahî û tarîfî, giyan û laş, cîjhana diyar û nediyar. Hem nêzikî Xweda ye hem jî dûrî Xweda. Dûrî Xweda ye cismanî û zevînî ye, nêzikê Xweda ye rûhanî



û asimanî ye. Mirov her çend rû ve biçûk e, lê di batin de lewra ko neqşa qelema kibriyayîye mezin e.

Di wan helbestên han de em di gel hemberanî kirin û hevtasaziyekek dulayenî rûberû ne. Em mesela

dulayeniyê (Senewiyet-doganegî) di şûnewarên Îşraqiyan û mezhebê Zerdoştî de dibînin. Zerdoşt bawerî bi Xwedayê qencî û neqenciye yanê xêr û şerê heye, ew cudayiya wan herduyan wisa bilind dike ko wana dijî hev nîşan dide. Lê Îşraqiyan ko regeyek li mezhebê Zerdoştî di bîr û bawerên wa de xwiya dike evê dulayeniyê kêmtir û mulayîmtir dikan. Em evê dulayeniya Îşraqiyan di pişka zore helbestên Xanî de dibînin, lê Xanî Îşraqî nîne, ew li jêr kartêkirina Îşraqiyan daye. Xanî arif e, arif her çiya ko dibîne tirîşkdanewe û ispênêkirana nûra xwedika (neynika) Xwedê dizanin. Yanê giştî bûnewaran xwedîkekê dizanin ko nûr û ronahiya cimal û ciwaniya Xwedê di wan de ispêne dike û tirîşk vedide.

Her wusan arif dibêjin cîjhan weke neynikekê ye ko aliyekî wê reş û tarî û aliyê di ronahî û çilvilok û paqij e. Layê tarî û reş cism û laş e, layê ronahî û paqij jî rûh û dil e. Dibêjin Xwedê xwest ko cimal û ciwaniya xwe bibîne û dîna xwe bide husn û cemala xwe, îca bo vê hindê cîjhan û bûnewar wekî neynikekî afirand ta ser gotina hedîsa qudsî di wê neynikê de xuya bike û dîna xwe bide husn û cemala xwe. Vêca Xwedê perde li ber cemala xwe hilgirt û Adem kire neynika cemala xwe. Gava cemala xwe di wê neynikê de dît, bû evîndarê xwe. Xanî jî li ser vê bîr û bawerê dibêje:

”Ayîne te çêkirin mukerrir

‘Husna xwe di wan te kir musewwer

‘Husna te ye zîneta ‘hebîban

Reşka te ye ‘xîreta reqîban

Meyla te ye ‘aşiqan dikêşî

Derdê te ye dil ji ber diêşî”

Yan di pesnê ciwaniya Sîtiyê de dibêje:

”Ew sen’etê ûstadê mutleq

Her çî ku didî digo huwel’heq”

Xanî li beyta (26)ê re digel pesn û spasa Xwedê basê tewawî heyiya cîhanê û felsefa afirandina wan tiştana

dike ko hebûna her yekê ji wan têra bunecîkirina hebûna Xwedê dike û dibêje:

” Ev renga felek hemî mu’ezzem

Ev çendemelek hemî mukerrem

Ev karigeha ‘ezîm û devvar

Ev barigeha bedî’ û seyyar

Ev çende zemîn digel ‘enasir

Ev renga ‘erez digel cewahir

‘Heywan û me’adin û nebatat

Metlûb û meqasid û muradat

Ey baqiyê bêzewal û daim

Wey hadiyê bê fenayê qaim

Mulk û melek û felek bi carek

Bilcumla te çêkirin teberek

Ev neh sedefê di pirr mirarî

Durrê di sipî şebê di tarî

Heftê di misalê durrê ‘xeltan

Her şeş cîhet û çihar-i- erkan

Hersê weledê di pirr mewalîd

‘Xebra û sema di gel meqalîd

Lew’ h û qelem û sewabit û ‘erş

‘Heywan û nebat û me’den û fers

Zahir te kir ev qeder senayî’

Peyda kirin ev qeder bedayî’

Her yek ji ‘edem kirin te peyda

Ibda’ kirin te bê heyûla”

Xanî di van helbestanan de di gel wê hindê ko îşare bi felsefa afirandina cîhanê dike, radigehîne ko cîhan hadise û qedîm nîne. Bawerî bi hindûsa cîhanê yek ji baweriyên mezhebê Eşerî ye. Emê evê hindê paşê şirovebikin.

Di helbestên han de Xanî dibêje: mulk û melek û felek, karigah û barigah, erd û enasir, erez û cewahir heywan û me’den û şînewerd, neh tebekê asîmanan, yan neh felekên cîhanê, şev û roj, her heft şîrên gerok, her şeş alî û erd û esman, lewh û qelem û erş û fers hemû Xwedê ji nebûnê aniyê hebûnê. Pêşda ewana tune bûn, paşê bîyî madeya eweliye bîyî heyûlaya binêşeyî afirand.

* Lêrede ronkirineweyek bo beytên 44ê ta 49ê pêdivî ye. Gorekî bir û hizra zaniyar û filosofên berê Xwedê pêşda

eqlê kul afirandiye, eqlê kul jî bûye egera peyda bûna nefsa kûlî. Li wan herdûyana neh tebekên asîmanan û heft şîrên gerok û şîrên rawestayî serrast bûne. Gera şîr û erd û asîmanan jî bûne egera peyda bûna tebiyetên çarane yanê: Serma, germa, hişkati û terati û herçar unsur yanê: Av, agir, ax û ba. Neh tebekê asîmanan û çar unsur jî dibin egera peyda bûna meeden û heywan û şînewerdan, ko mewalîdê selase yan zarokên sêyîne dibêjinê. Ewana heft tebekê asîmanan re bavê heftîne yan heft bavên asîmanî û ji av û agir û ba û axê re jî çar dayîk yan dayîkên çarîne digotin. Xanî ji durust îşare bi wê hindê dike û dibêje:

” Fîlcumle çi ewwel û çi axir

Elqisse çi muimin û çu kafir

Bê ‘husnê te nîne wan wicûdek

Bê nûrê te nîne wan nimûdek

‘Hikmet ewe batinê û zahir

Qudret ewe ‘xayibiyû ‘hazir

Nînin te te’heyyuz û temekkun

Emma we di wan dikî tewettun

Goya hemî cismek in tu can î

Goya hemî şehrek in tu xan î”

Dîsan Xanî dibêje: Xwedê tewawî cîhanê bîyî madeya eweliye yanê heyûlayê ji nebûnê aniyê hebûnê. Dibêje: Tewawî heyîya cîhanê mezherêk ji hebûna Xwedê ye. Her yek nimûd û sîmbolek ji Xwedê ye, Xwedê di tek tekî wan de veşartîye, bîyî ciwanî û husna Xwedê bîyî nûra Xwedê ew tiştane yek ji hebûna wan diyar nake. Her weha Xanî dibêje: Her çend Xweda di çi tiştî de cî nagre û teheyyuz û temekkuna wî çineye, lê di tek tekî wan de heye. Tu dibêjî qey tewawî bûnewerên heyî laşek in û Xwedê giyanê hemûyan e. Di van beytan de evê hizra arifane hildixe ko Xwedê nûr û ronahiya cîhanê û canê cîhanê û canê cîhanê ye. Hemû bûnewer bi ronahî û nûra ciwaniya wî tîne xûyan û hebûnê peydadikin. Dîsan

Xanî lêrede pirsar wehdet di kisret û kisret di wehdetê de ko binêşa bîr û bawera arifane hildixe.

* Li beytên 56ê ta 88ê bîr û baweriya mezhebiya Xanî ji me re ronahî dibe. Emê vira de îşare bi çend beytan bikin.

"Her çî divê bibî zelalê

Pabend dikî bi zulf û xalê

Her çî ku tu bînî ser hidayet

Vêrra bigirî bikî 'înayet

'Hazir wî dibî meqamê me'lûm

Ger xadime wî digêrrî mexdûm

Bê sicde te ey cenabê me'bûd

Adem kire qiblegah û mescûd

Iblîsê feqîrê bê cinayet

Hindî te hebû digel 'înayet

Her roj dikir hezar ta'et

Lewra ku te da wî istitta'et

Wî sicde nekîr li 'xeyrî me'bûd

Gêrra te ji ber derê xwe merdûd

Yek sicde nebîr li pêş e'xyar

Qehra te kire muxeledunnar"

Bi xwendina van beytana ji me re ron û eşkere dibe ko Xanî di mezhebê xwe de sunniyê şafiîyê eşerî bûye. Eşerî li himber mutezelê daye. Êşerî bawerî bi cembrê hene û mutezele bawerî bi ixtiyarê. Cembrî dibêjin, herçiya ko li cîhanê de diqewime û dê biqewime bi xwast û ferman û viyana Xwedê ye. Bêyî viyana Xwedê pelg ji darê naweşe. Eva ye ko Xanî dibêje, Xwedêyo, te hezretê Adem bêyî taet û ibadet û sicde kire qiblegaha cîhanê, lê Iblîsê feqîr ko şev û roj ji te re hezaran taet û ibadet dikir te ew her ji ber vê hindê ko amade nebû serê xwe ji bilî te ji kesekî di re xwarbike, ji ber dergahê xwe raqetand û kire cehennemiyê herehereyî. Xanî di kutayiya Mem û Zînê de dema ko digel qelema xwe qise dike dîsan cembrîbûna xwe radigehîne. Ev bîr û bawera bi ronahî li beytên 2600ê ta 2653 re diyar dike.

Li beytê 94ê ta 189ê ko li pesna hezretê Muhammed û çawaniya afirandina

cîhanê û maracê daye, Xanê îşare bi burhana îmkan û wicûbê dike û dibêje:

"Eşya bi 'hesab delîl û burhan

Nabin çu meger wicûb û imkan

Wacib yek e zatê kibriya ye

Mumkin pirre cem'ê masewa ye"

Ev beytana li ser çawaniya afirandinê û egera afirandina cîhanê ko Xwedê giştî cîhanê bo xatrê hezretê Muhammed afirand dom dike ta dighîje beyta 188ê.

* Li beyta 189ê re Xanî digel berçavgirtina hedîsa "Men erefe nefsîhî feqed erefe rebbîhî" û digel berçavgirtina vê hindê ko çî marîfet û nasîneweyek paşî nasîneweya Xwedê mezintir û baştir û çêtir li xwenasîn û nasîneweya mirovan nîne, dest bi nasîneweya gelê xwe dike ko bi xwe jî endameke li wê komelê. Em evê jî bêjin arif yanê kesê ko irfanê bizanibe. Wateyek irfanê jî agadarî û zaniyarî ye. Mezintirîn û serratirîn taybetmendiya her mirovekî zaniyar û guhorînkar û xebatkar agadarî ye. Mirovê agadar ew mirov e ko agadariyek giştî li ser hemû ho û egerên aqara jîna xwe, çawaniya hebûna xwe peyda bike û çî caran bi ruwalet û rûvayiya tiştan nexape û lêpa reng û rûyan nexwe. Lewra ji arifan re agadar dibêjin ko li ser gişt kar û barên madî û manewiye jînê agadar in. Arifê me yanê Xanî jî xwedanê vê taybetmendiya bilinde mirovaniyê ye. Ew her çend ko li gûna zor û zulma sultanên Osmanî û şahên Sefewî de diji, lê pê gotin û nivîsîna Mem û Zînê:

"Şer'ha xemê dil bikim fesane

Zînê û Memê bikim behane"

Piştî helêxistina evîn û irfana ilahî û derbirîna cîhanbîniya xwe û pesnê Xwedê û Pêxember hedîsa: 'Men erefe nefsîhî feqed erefe rebbîhî' Ji xwe re dike binêşe û gelê xwe dide nasandin.

"Sabit ke ku da ne naxelef bi

Da waqîfê sirra men 'eref bi"

Ew bi çavekî komelnase û rewannase perdê ji ser çawaniya Kurdan davêje û

li sedeya 17ê de ko hê bîr û hizra
netewayetiyê li nav çî gel û welatî de
nehatibû hilxistin, hildixe û jarî û
belengaziya Kurdan her wîsa egera wê
belengaziyê destnîşan dike û dibêje:

"Hindî ji şeca'etê 'xeyyûr in
Ew çend ji minnetê nifûr in
Ev 'xeyret û ev 'uluwê himmet
Bû mani'ê 'hemlê barê minnet
Lew pêkve hemêşe bêtişaq in
Daim bi temerrud û şîqaq in
Ger dê hebûya me ittifaqek
Vêkra bikira me inqiyadek
Rom û 'Ereb û 'Ecem temamî
Hemîyan ji me ra dikir xulamî"

*Eflatûn dibêje:

Giyanê mirov di cîhana berîn de pêş
wê hindê ko bikeve ser cîhana cismanî
û bikeve laşê mirovan de, ciwaniya
mutleq û rastiya ciwaniyê bê perde
dîtiye. Gava ko di vê dinyayê de
ciwaniya rûveyî dibîne dikeve bîra wê
ciwaniya mutleq û dibe evîndarê wê.
Ruhê mirovan di vê dinyayê de weke
baldariyeke ko ketibe rekeh wate
qefesekê. Ew baldara dixwaze vê qefesê
ko cismê wê ye bişkêne û xwe bigehîne
ciwaniya mutleq... eşq û evîna mutleq
pireke bo gehîştina evîna heqîqî û
ciwaniya mutleq.

Arifê bi nav û bange îranê Mewlewî ji
dibêje:

"Mur'xê ba'xê melekûtem niyem ez
'alemê xak

Çend rûzî qefesî saxitêend ez bedenem"

Xanî jî dibêje:

"Saql bike cama asimanî

Ra'ha wekû rû'hê cawidanî

Da em bikirin dema'xê can ter

Yek le'hze bi ra'ha rû'hperwer

Teisîri nefes bibit ji bo min

Teşîrî'hi qefes bibit ji bo min

Mur'xê dilê murde bête perwaz

Bê perde bibit teraneperdaz

Bed'hal bibim seran bi derd im

Bê al ji batinê xebardim

Teşbîhî neyê bikim terrenum

Totî sifet ez bikim tekellum

Da keşf bibin ji min keramat

Meşhûd bibin li min meqamat

Xelkê ji "yu'hubbêhum" digergûn

Her çî ji ezel bûyî "yu'hubbûn"

Da bîn û biken 'hikayetê gûş

Hindek bikirin xwe pê feramûş

Hindek bikirin bi can sema'ê

Hin pê bikin ji dil wuda'ê"

Xanî jî di van beytana de bi curekî

rûvayî ewê hindê radigehîne û basa

murxê dil dike û p'san îşare bi ayeta 54

li sûreya 5 ko mebesta wê ew e Xwedê

evîndarê mirovan û mirov jî evîndarê

Xwedê ye, *Yuhubbuhum* we

yuhubbûne dike û dibêje: Meygêrê!

Cama asimanî pir li meya giyanperwer

bike ko ez pê wê meyê mejiyê giyanê

xwe ter û têrav bikim, da ko qefesa laşê

min bişke û ez xwe li holê rakim û

baldara dilî ko dîrî hêlûna asimanî û

dergahê rûhanî û îlahî bûye, wek neyê

binalînim û miqamê evîndariyê lêdim

da ko ew Xaliq û mexlûq, ew aşîq û

maşûqê roja berîn, *Yuhubbuhum* we

yuhubbûne bîn û evê serhatiya

evîndarane û arifane, sebuhorîya Mem

û Zînê guhdarî kin û xwe pê bihistina

wê gum kin û di Xwedayê xwe de

winda bin û bigehine qonaxa

fenafîellahiye. Xanî bi van gotinên hanê

çîrokê destpêdike û çîroka Mem û Zînê

jî he li ser vê bîr û bawerê vedihûne û

bi wê şeweya eflatûnî baldara ruhê wan

digihîne ciwaniya mutleq.

LI SER QEHEMANÊN ÇÎROKA

IRFANÎ YA MEM û ZÎNÊ

Qehremanên vê çîroka irfanî birtîne li:

Sitî û Zîn, Mem û Tajdîn, Bekirok û

Mîr Zîneddîn, Arif û Gurgîn, Çeko û

Dayîn.

Sitî û Zîn, Mem û Tajdîn, Bekirok û

Mîr Zîneddîn qehremanên sekerî ne.

Arif û Gurgîn, Çeko û Dayîn jî

qehremanên layekî ne. Xanî tenê ji bo

kutakirin û hevanîna çîrokê li

qehremanên layekî wêcê verdigre.

Dimîne qehremanên serekî.
 Qehremanên serekî jî dibine sê desteya.
 Sitî û Tajdîn evîndarên cismanî û zevînî
 ne. Mem û Zîn evîndarên rûhanî û
 asimanî ne. Bekirok û Mîr Zîneddîn jî
 nûnerên xerabî û neqencyî ne. Evîna
 zevînî û cismanî qonaxa tekûzkirina
 evîna asimanî ye. Eger aşiq û maşûq di
 evîna zevînî de pijiyar û tê da kamil
 bûn û gihîştin, di evînê de dişewitin.
 Eger li ser rûbarê dinyayê negihîştin
 hev dighîjin evîna rastî û evîna rûhanî û
 asimanî. Lê eger li evîna zevînî têper
 nebûn û he di meyla wusala cismanî de
 man, difewitin. Em di çîroka irfaniya
 Mem û Zînê de dibînin ko Sitî û Tajdîn
 he di cara yekê de ko hevdu dibînin, bo
 pêkgehiştina zevînî û cismanî hazir in
 hemû karî bikin, belam Mem û Zîn wa
 nîn. Bo nimûne gava ko Dayîn gustîlkê
 ji Sitî û Zînê dixwaze Xanî weha
 dibêje:

"Hazir Sîtiyê nigîn deranî

De destê 'ecûzeyâ zemanî

Lê:

Zînê wehe gote 'Heyzebûnê

Min dil bûye werteyek ji xûnê

Gava wekû werte tête coşê

Wextê ko diket biket xuroşê

Teskîn diket ev nigîn dilê jar

Dem dem ko didem di çesmê xûnbar

Zînhar eger dibî nigînê

Zû bineve bo mi dil'hezînê

Lewrra bi wê ye mi sebr û saman

Ew bo min e xatema Suleyman"

Yan gava ko Dayîn diçe gustîlkên Sitî û

Zînê ji Mem û Tajdîn bistîne, Tajdîn bo

wê hindê ko navbenda wî û Sîtiyê xweş

be û zû bigehine hev zûka gustîlê dide

dayînê, lê Memê gustîlê nade:

"Tacdîni nigîn ji dest deranî

Da destê 'ecûzeyâ zemanî

Mem tê fikirî ko bêy nigînî

Kengê diketin medar û jînê

Go: daye tu min bidêre me'zûr

Kê canî didet ji dest xew destûr

Ev xateme ism e ger tilism e

Min can ew e qalibê me cism e

Ev daye, tu qasidê 'hebîb î

Bê şubhe li derdê min tebîb î

Sedqa serê zîcemalî Zînê

Mestîne ji destê min nigînê

Gava tu diçîve ey wefadar

Ev renga ji min bibêje dildar

Ew şah e eger çi ez geda me

Eltafê şehenşehane 'am e

Ez bende ne laiqê wusal im

Xursende bi sûretê xiyal im

Razî me ji ew qeder cemalê

Min bînite xelweta xeyalê"

Em dibînin ko Mem şeyda û evîndarê

cemala asimaniya Zînê ye û daxwaza

wusala zevînî nake û dibêje bila Zîn di

xiyalê xwe de min bîne bîra xwe. Ev

bîrhanîna xiyalî seratayek e bo evîna

rûhanî û asimanî. Herwa dema ko Mem

û Zîn di nav baxê Mîr de hevdu dibînin

herçend ko tenê ne û wesayîlê wusala

zemînî ji wan re saz e, lê Xanî dibêje:

"Hubba du dilan ji 'heddê derbû

Ser 'heddê zerafetan kemer bû"

Zîn û Mem wusala zevînî û cismanî

naxwazin, evîna wan evîna asimanî ye

û ewana evîndarên dawên pak in.

* Me got ko Mîr û Bekirok jî di vê

serhatiya irfanî de nûnerê şer û

neqencyî ne, lê egerê bineşeyiye

negihîştina vê dinyayêye Mem û Zînê

Bekirok e. Xanî gorekî bîr û hizra

arifane ko dibêjin tewawî heyiyê vê

dinyayê nimûd û sîmbolek li Xwedane,

şer û neqencyî jî he mezherêk ji

mezherên Xwedê dizanê. Lewra ew

Bekirok jî ko bûye egera tekûzbûna

evîna rûhaniya Mem û Zînê, û nehêlaye

ewana bigihîjin wusala zevînî, wusala

ko afet û aşîta evîna ruhanî ye. Di

kutayiyê de li şaya serê evîna

rasteqîneya Mem û Zînê digihîne

pileyek rûhaniyê û dike dergevanê

bihîştê.

Lê mîr ko binêşê de dixwest Mem û

Zîn bigijîn hev û di dilê xwe de razî bi

peywendî wan bû, her wusan di nîviya

rê de poşman bû û destûra Zînê da ko here Memê ji xwe re azad bike, nagîje wê pilê û meqama rûhanî ko Bekirok gihîştîyê. Xanî li bara evîna zevînî û asimanî de dibêje:

"Ger şêx in û ger mela û mîr in
derwêş û 'xenî weger feqîr in
Kes nîne ne talibê cemalê
Kes nîne ne ra'xibê wusalê
Hin ra'xibê 'husna layezal in
Hin talibê qalibê betal in
Lakin hemîyan yeke yeqîn dost
Ferqa ku heye ji me'xz ta post
'Husna ku nebit çu 'hedd û 'xayet
Nabit ji bo 'aşiqan nihayet
Lê 'aşiq û bulhewes cuda ne
Hin faidexaz û hin fida ne
Canan teleb in hinek ji bo can
Hin can teleb in ji boy canan
Hin wesl'heb in ji rengê Tajdîn
Hin derdguz in wekî Mem û Zîn"

Evaye cudayîya evîna Mem û Zînê digel evîna Sîtî û Tajdîn. Sîtî û Tajdîn canan (Maşûqê) ji canê xwe re dixwazin. Lê Mem û Zîn canê xwe ji canan re dixwazin.

* Lê tişta here giring di serhatiya evîndaraneya Mem û Zînê de mirina mecaziya wana ye. Mem û Zîn herdu carekî dimirin û ruhê wan dighîjin hev û xelk pêkgihîştina ruhê wan dîsan zindî dibin. Dema ko Mîr ji karyarê xwe peşîman dibe û dibêje: Zînê here Mem ji xwe re azad bike, Xanî ji zarê Mîr weha dibêje:

"Dîsan tu herre digel xeberde
Qeydan tu veke ji bo xwe berde
Ey 'xunçeyê naşikufte sorgul
Bişkên qefesê derîne bulbul"
Zînê bi bihîştina vê mizgîniyê li ber xweşîya şanemergî dibe û nehiş dikeve û weke miriyan dikeve erdê.

"Zîna ku dused birîn li cergê
Ço 'haletê fewtê şadimergê"
Gava ko cemaeta heremserayê li Mîr tûre dibin û dibêjin, te çira Zîn kuşt tu bûyî egera mirina Zînê, Mîr dibêje:

"Mîr go mekirin xiyalê batil
Ew bêhuşê ez nebûme qatil"

Lê ehlê heramserayê her çend dikin û nakin Zînê li nehişîyê dernakeve û nayê serhemdê xwe, da ko kesek ji derda tê û dibêje, serê we xweş Memê temenê xwe da we:

"Yek hat ji derve nagehanî
Go, Mem mir û da we zindeganî"
Dema ko Zînê navê Memê dibîze ruh dikeve ber:

"Zînê mirina Memê bi guh ket
Goya miribû ji no bi ru'h ket"

* Lêre de ye ko Zîn sira dilê xwe bal wan êşkere dike û pêkgihîştina xwe û Memê di cîhana ruhanî de li bal hemûyê servedike û dibêje:

"Can çûvo bi canî muttesil bû
Ev ru'h bi ru'hî muzme'hil bû
Ru'h im te ji dil dema riza da
Şah im te di mulkê ten sela da
Cismê mine bînewa giran bû
Ru'ha mine natewan rewan bû
Der'hal ji qalibî bi der ket
Şewqek ji ru'ha Memê bi ber ket
Wan terk kirin serayê fanî
Lew çûne cîhanê cawidanî
Har çî ku qebûl neket meknan
Dê seyr biket di lameknan
Hûn vê seferê 'xelet mexûnin
Şahid ji mirra muqerrebûn in
Gava weku can ji ten rewan bû
Canan ewî dît û can bi can bû
Fîlcumle ji merkeza turabê
Ew zerre gihane afitabê"

Di vira de Xanî bi zimanê Zînê gihîştina ruhê evîndaran bo hev û gihîştina wan bo zatê heq ko armanca serekiya arifan û kutatîrîn pileya irfanê yanê qonaxa fenafiellahiye ye, radigîhîne û paşê dîsan bi zimanê Zînê dibêje:

"Şêxê wekî ez bi dil murîd im
Ew ru'hê rewane ez qedêd im
Her çend li ba we navî Mem bû
Lê padişehê 'elahumem bû
Bû layiqê ferrê padişahî

Meqbûlê teqerruba ilahî
 Qelbê wî ye wadiya muqeddes
 Ru'ha wî bi nûra heq muqebbes
 Hilgirtim û birme Tûrê Sîna
 Bînende kirim digel xwe bîna
 Îname derê ji vê 'hicabê
 Ev zerre gihande afitabê"

Lêre de em dibînin ko Memê di rêka
 evîna rastaqîne û asimanî de gehîste
 pileyek wusan bilind ko bû meqûlê
 teqerruba ilahî û qelbê wî ko weke
 çiyayê Tûrê Sîna ronahiya xwe li heq
 vergirtibû, bû egera wê hindê ko ruhê
 Zînê jî ko weke zerreyekî bû gihande
 afitabê û ew jî digel xwe bire wadiya
 muqeddes.

Piştî hingê Zînê van sir û razana ser
 vedike, bi destûra Mîr "Sed carîye û
 Sitî û Dayîn" çûn ko Memê li
 bendixanê derxin. Lê gava ko gihîştin
 zindanê dîtin ko Memê:

"Durrdayê Bêbehayê canî
 Derdayê ji dest xwe rayiganî"

Ewana çawaniya qewimînê ji bendiyan
 dipirsin:

"Xelqê ku digel Memê giriftar
 Gotin ku me dî ji set'hê dîwar
 Berqek bi 'ecêb Memê bi ser ket
 Şewqek ji serê Memê bi der ket
 Yek şubhetî roj û yek çu hîv bû
 Yek şubhetî zêrr û yek jî zîb bû
 Ew şems û qemer ku mettesil bûn
 Der'hal bi pêkve muzmehil bûn
 Gava wekû pêkve muqtebis bûn
 Ew herdû li zewîê mun'ekis bûn
 Ew reng kiriyan munîr û rewşen
 Zindan li me kirne se'hnê gulşen
 Mem jî bi vî rengî bêxeber bû
 Xûna dilê wî bi derve der bû"

* Xanî dibêje ko hemsuhbetiya Memê
 di bendiyan de jî eser kiribû. Kar li ser
 wan kiribû, ko ewana li jêr kartêkirina
 Memê çavê dilê wan roşin bibû û karîn
 ewê dîmena han, wate teceliya ruhan bi
 çavê ser bibînin. Xanî li dû re dibêje ko
 teceliya ruh tiştêkî rast e, evê hindê
 înkâr nekin. Ew yeka hulûl yan nesx û

xurûc û duxûl nîne. Ew tenasuxê erwah
 nîne. Belkû ew tiştêkî rast e, wekî
 xewnekê ye. Lê xewn tiştêk li şihûda
 nivîşkane, teceliya ruh ser xewnê re ye.
 Gava ko Sitî û Zîn, carîye û Dayîn rastî
 laşê bêgiyane Memê tîn, herçend dikin
 û nakin, nikarin Memê ji nehişiyê
 rakin:

"Hindî ku reha dilî dişandin
 Hindî ku gulav lê reşandin
 Wan sehnekirin di cismî canek
 Illa ji serî diçû duxanek"

Daku:

"Zîn hat û ji pêşve bû 'hewale
 Bedrê ku veda ji ber xwe hale
 Burqe' ku veda ji ber cemalê
 Xurşîd numa digel hilalê
 Zînê wehe gote wî bedîhî
 Qum ya ceseden nefexto fihî
 Şewqa xeberê di wê şepalê
 Berbûyê serê di wê şemalê
 Wî dûyî qebes ji şewqê ragirt
 Qendilê qefes qebes ku dagirt
 Ew xelwetiyê di ê'tikafê
 Rabûve bi niyyeta tewafê"

Piştî Xanî ji zarê Zînê got ko qelbê
 Memê wadiya muqeddes e û ruha wî ji
 nûra heq bizot û nûr vergirtiye û Memê
 bi evîna rastaqîne ew nûra ko cemala
 layezal e, berda ye dilê Zînê, vê carê jî
 Zînê îca nûra dilê xwe berdide serê
 şemalka vemiriye laşê Memê û ruh bi
 laşê bêruhe Memê dixê û ewî zindî
 dike. Xanî bihanîna ayeta 29ê li sûreya
 15ê ji Qurana pîroz "Qum ya ceseden
 nefexto fihî" zindîkirina Memê bi destê
 Zînê digel zindîkirina Adem bi destê
 Xwedê beranber dike û wana dide
 berhev. Xanî cemala xwe û cezebeya
 Zînê pişkekê ji cemala layezalî dizane û
 dibêje, çawa Xwedê bi cemala xwe pufî
 qalibê bê giyane Adem kir, Zînê jî
 wusan Memê mirî vejand. Piştî hingê
 Xanî bihanîna vê beytê:

"Perwaneyî şem'wê 'teyîsa
 Wer murdeyî hate ser te 'îsa"

Îşare bi zindîbûna miriyan bi destê hezretê Îsa jî dike û evê hindê digel wê yekê jî beranber dike. Çawa miriyên mûcîza hezretê Îsa bi evîna dîna tecelaya heq di rûyê Îsa de zindî dibûn Memê jî bi evîna dîna rûyê Zînê ko tecelaya cemala Xwedeyê zindî dibe.

Piştî wê hindê ko Mem zindî dibe û digel Zînê dikeve qisadanê, ew cemaeta ko li wê derê bûne, dibêjin, Memê rabe em biçin ba Mîr, Mîrê ko destûra zewaca te digel Zînê daye, rabe mirazê te hasil bû. Memê weha bersiva wan dide:

"Ez naçime 'hezreta çu mîran
Ez nabime bendeyê esîran
Mîrê ku mirin hebit ne mîr e
Me'zûlî hebit ewî esîr e
Em çûn 'hizûra mîrê mîran
Wî 'hakimê 'hakim û feqîran
Ê çêkirî neynûka cemalet
Tîra xwe numa bi zulf û xalê
Fanûsa beden kirî mutella
Têda ji mirra kirî tecella"

Li dû wan gotinana re Memê dibêje, em pêkgihîştina vê dinyayê naxwazin, emê herin bihiştê û hûr û xilman çav li riya me ne ko daweta me bikin. Emê di bihiştê de bigihîjin hev. Lê bihiştê me bihişteke dî ye:

"Lê cinneta 'aşiqan cuda ye
Mî'ad liqaya kibriya ye
'Alître ew ji baxê rizvan
Naguncine wê çu hûr û 'xilman"
Memê li dû van gotin û daxwazane re dimire:

"Gava ewî kir temenna axir
Dergah vebû li ber wî hazir
Teyrê ku qefes li ber vebûyî
Ew reng firrî wekî nebûyî
Şehbaz ji qeyda merkeza fers
Prewaz kir û gihîşte zul'erş"

Xanî li vira de dîsan îşare bi baldara ruhî dike ko ji hêlîna xwe ya binêşî dûr ketiye û dîsan diçe digihîje binêşe û heqîqeta xwe.

* Em dibînin ko Xanî di vê serhatiyê de Mem û Zînê di pileya here jêrîn ko rojekî li cil û bergên guhorî de tolazî dikirin bi saya evîna rasteqîne digihîne pileya here bilinde ruhaniyê û zereya wicûda wan digihîne afitabê û baldara giyanê wan digihîne hêlûna binêşeyî û giyanê wan digihîne canan û ewana digihîne cîhana cawidanî û heqîqetê. Eve rêbaza arifan e. Arif dibêjin mirov dikare li saya evîna rasteqîne de û destkişandin ji daxwazên vê dinyayê û fenaya xwe bigîje beqaya ebedî û bigîje heqîqeta Xwedayî:

"Fanî mebitin fenayê mutleq
Nabînitim ew beqayê bil'heq
Fanîti ji bo wîrra beqa ye
Baqîti ji bo wîrra leqa ye"

Xanî mirina mecaziya Mem û Zînê teceliya ruh dihejmêre. Ew layekî dixwaze pileya here jorîne evîne ko li rastiye de fanafîallah û gihîştina zereyekî bo tava ehdiyetê nîşan bide û layekî dî jî radigihîne ko pêkgihîştina zevînî bend û sedek e bo pêkgihîştina asmanî. Xanî bo nîşandana vê hindê dest davêje bikaranîna şeweyek taybet û nenasiyar û neasayî. Şeweyek wusan ko hem jortirîn pileya tekamulê nîşan dide û hem jî evîn dibe evîna ruhanî. Ruhê Memê û Zînê li pêş cemaetê de dighîjin hev.

* Mirov li bara mirina mecazî yan bi gotina Mewlewî mirina pêş mirinê de dikare sê pîrsê giring bide ber çavan. Ya yekê: Mirin û zindîbûna Memê û Zînê di kerametê arifan de tişteki hêjayî bûnê ye, arif bi îzn û destûra Xwedê dikarin tiştê weha bikin çawa ko Mewlewî arifê mezinê Îranê dibêje:

"Ewliya ra hest qudret ez Ellah
Tirê ceste baz arendeş zi rah"

Wate: Qudret û karîna ewliyayan ji karîna Xwedê ye. Ewana dikarin bi qudreta Xwedê tîra ko ji kevên derketiye li nîviya rê de bizivîrinin ser ciyê wê.

Ya duyê: Hindek arif li ser vê bawerê ne ko eger mirov gihîşte jortirîn û serratirîn qonaxa teequlê ko qonaxa eqlê feal dibêjinê, dikarin ruhê xwe têxin ixtiyara eqlê xwe ko ji wê hindê re mufariqetê nifûs min el ebdan yanê cudayiya can ji laş dibêjin.

Wate: Eger mirov gihîşte wê pileya teequlê, her gava ko bixwaze dikare ruhê xwe ji laşê xwe derîne û dîsan vegeirîne laşê xwe.

Memê jî di zindanê de dibe sofî û paşê ta pileya şêxîniyê jî diçe, çawa ko Xanî dibêje:

"Sofî ko gihîşte kuncê xelwet
Şêxînî gihand meqamê we'hdet"

Mem di zindanê de digihîje axirîn pileya irfanê ko pileya wehdetê ye. Di vê qonaxê de salik tenê tiştêkî dibînin û ew tişt jî her heqîqeta mutleqe û bes. Xanî dîsan ji zimanê Zînê dibêje ko Mem Şêx e:

"Şêxê wekû ez bi dil murîd im
Ew rû'hê rewanê ez qedîd im"

Yan gava ko Memê di zindanê de ye, Xanî ji zarê Memê dibêje:

"Sofî me û sewmî'e nişîn im
Xoş talibê nûra rûyê Zîn im
'Hasil qewimî meqamê mûtû
Bermewcibê qeble en temûtû"

Vêca Memê jî gorekî vê bir û rayê dikare ruhê xwe li laş azad bike û dîsan bi teceliya rûyê Zînê ewî vergerîne ser ciyê xwe. Xanî pêş vê qewmînê gava ko Memê di zindanê de ye, bi hînana hedîsa: "Mûtû qeble en temûtû" Mirina pêş mirinê ji Memê re pêşbînî dike.

Ya sêyê: Hunur û fendekî çîroknivîsiyê heye ko dibêjinê flaşforward. Flaşforward li himber flaşbakê de ye. Flaşbak ew e ko nivîskar demên bihurî û bireweriyên çûyî di bîra qehremanê çîrokê re derbas dike. Lê flaşforward dahatiya ko neqewimiye, qewmîna ko dê biqewime, di bîra qehreman re derbas dike û tîne pêş çavên wî. Xanî jî digel wê hindê ko li evê teknîka

çîroknivîsiyê wêcê verdigre flaşforwardê li qonaxa zêhnîyetê digehîne qonaxa eynîyetê û ewê bi navê teceliya rûh nîşan dide. Ev hinde gorekî bîr û raya irfanê heman fenafiellahî ye.

Lê Mewlewî arifê îranî jî vê hindê re digel berçav girina hedîsa "Mûtû qeble temûtû" mirina pêş mirinê dibêje:

"Mergê pêş ez merg in est ey feta
In çunîn fermûd ma ra Mustefa
Goft mûtû kullêkum min qeble en
Yeitiyelmewto temûtû bêlfetên"

Mewlewî evê hindê li çîroka temsîliya Totiya Bazirgan de tîne û dibêje:

"Qissêyê tûtiyê can zîn san buwed
Kû kesî me'hremê mur'xan buwed"

Wate: Çîroka Totiya Can jî her wek vê ye, lê kanê ew kesê ko bibe mehremê baldaran.

Bi vê hindê em digihîjin vê akamê ko çîroka Mem û Zîn çîrokek irfanî ye. Xanî arifekî tam e. Ew çîroka xwe li jêr kartêkirina irfana îranî dinvîse. Xanî digel toreya farisî baş nasiyar e û ewî tewawî zanistên gûna xwe bi başî zaniye. Digel şûnewarên hozan û torevanên mezine Îranê yê weke: Firdewsî, Se'dî, Hafis, Camî, Ettar û Mewlewî baş nasiyar bûye. Çîroka wî di bara bîr û hizrên irfanê de birekî li jêr kartêkirina Îşraqiyan, bîr û hizrên Şêx Şehabeddînê Sorewerdî daye. Lê bara toreya de jêr kartêkirina Nizamiyê Gencewî de ye. Heta kêşa helbesta Mem û Zînê jî li ser kêşa Leyl û Mecnûna Nizamî yanê kêşa "Mef'ûlu mefa'êlun fe'ûlun" de ye. Lê her wekî me pêşda jî got Xanî li ser wana re ye. Xanî bîyî piştewaneya dîrokiya toreya di toreya kurdî de ev çîroka nivîsiyê.

Xanî ne wekî ewanê dî ko çîrokên irfanî nivîsîne û irfan tenê li seretaya çîrokê de xebitandine, belkû ewî bîr û hizra irfanî di seranserî çîrokê de raçav kiriye.


HUNERMENDEKÎ KURD


Di 25.5.1967an de li bajarê
Amûdê xwedê daye. Li Amûdê jî
ta bakalorya xwendiyê.
Di salên 1986-1987 li Şamê di
xwendegeha hunerî de xwendiyê.
Di salê 1987-1993 li Akademya
hunerî li Lenîngradê xwendiyê û
vê demê bo dektoratê li
Akademya şanoyî (hunerê dekorê)
dixwêne.
Di 2-3.12.1996an pêşangeheke
hevbeş bi hunermendên Rûs re li
Salona Yekîtiya Hunermendên
Rûs çêkiriye.



Cengo Elî








CENGİZ ALI



NERÎNEK

LI SER PROSES A KAFKA




Alanê Hajo

Proses yek ji pirtûkên Kafka yên herî binavûdeng e. Kafka li Pragê di 3.7.1880î de hate ser rûyê dinyayê û di 3.6.1924an de li Nemsayê mir. Çek dibêjin ew çek e, jiber ko ew li welatê wan bûye û li wir jiye, Alman jî wî dixine yê xwe, ji ber ko wî berhemên xwe bi almanî nivîsîne, lê ya rastî ew bi xwe cihû bû. Dive em ji bîr nekin ko welatê Çekan hê ji şesşed salî ve, berî bûna Kafka, beşek ji Impratoriya Nemsawî bû û weke ko em dizanin jî zimanê wê impratoriyê almanî bû û zimanê çekî dihate perçiqandin. Vêca nexerîb bû, ko wî bi almanî nivîsîbe.

Sedemên ko ez ajotime ber bi xwendina Kafka û pirtûka wî *Proses* ve, ji nav sedemên din, navdariya wî di rexnegirtina li civakê bû, taybetmendiya wî û navûdengê ko pê ketibû.

Pirtûka *Proses* li ser karmendekî payebilind e, ko li bankekê kar dike Cihê bûyeran di seranserê pirtûkê de naye diyarkirin. Karmend di baştirîn salên jiyana xwe de ye. Bûyer bi awakî

tîr destpêdikin û yekser diçine ser naveroka pirsê. Karmend zû dikeve rewşke bêhêvî, çaxê Josef K. , ew jî navê wî ye, beyaniyeke ciwan ji xew şiyar dibe û dibîne, ko du kesên ji binî ji re nenas di mala wî de ne. Ew herdû li ya xwe siwar dibin û dibêjin, ko ew ji aliyê dadegehekê ve hatiye girtin, ev dadegeh jî ji binî ji Josef K. re nenas e. Ev bûyer hê ji destpêkê ve bi tevayî xerîb û bê bingeş xwiyadike, bi taybetî dostê me Josef K. wilo hizir dike. Ew tore dibe, lê ji ber ko dikare weke berê jiyana xwe ya rojane berdewam bike ew nema vê pirsê ji dil digire. Ew weke berê diçe karê xwe û bi xwe ve mijûl dibe. Piştî mirov dirame, de erê ew bi çî hatiye tewankirin, lê ev ta dawî jî hişkere nabe. Dibe ko ji xwe ev tiştê baş be, ji ber ko mirov pêwîst dibe bi xwe birame, da bigehe encamekê. Erê, rast e Josef K. weke ko dizane bi şahî jiyana xwe didomêne, bê ko serê xwe bi bûyerê biêşêne. Lê zû bûyer her diçe tevlihev û aloztir dibe, gelek kesên din dikevine nav hûnana bûyerê û têkiliyên lehbok yên wan kesan bi Josef K. re derdikevin der. Wek nimûne yek ji van kesan berdestîka Josef K. ye û cîranenke wî ya bi navê zerî Burstner e, ko ew bi awakî mijane dilketiyê. Rûreşî zû berdewam dikin, wî dixwazine dadegehê ko bi cihekî genî tê pesindan, li wir mirov bi zorê dikare bêhna xwe bikişêne. Sîstema dadegehê dûrî aqilan aloz û hîrarkî digere, wek nimûne tîkes nizane kî yê dadgerê sereke ye û herewha bingeşên prosesê ji tawanbarên din re jî nezelal in. Josef K. parêzerekî (advokatekî) ko mamê wî bijartibû ji xwe re digire. Parêzer pîrekî qure ye û ji Josef K. re bêkêr xwiyadike. Kesên di pirtûkê de ji bilî Josef K. tev genî xwiyadikin, rebenên bêçare bê viyan in, ew diçin xwe bi 'wanên mezin' şahîk dikin, ji ber ko ew goman dikin dê ev yek parfîkîna



bigehêne wan. 'Ewên mezin' bi xwe jî rebenên ko yek hizira bikêrhatî di serên wan de nîne. Pesindana kesên ko cih di çîrokê de digirin, bêsinciya wanî rûstî, keysperestiya wan ko dikarin ji bo berjwewndiyên xwe pêl her tiştî bikin, dihêlê ko dilxelênek bi xwendevanan re çêbibe. Bi tenê Josef K. têdigehe ko ev nexweşiyê giran e û dixwazxe serî li ber hilde, lê hêdî hêdî ew nasdike ko ev tişteki pir bi dilêş e. Proses berdewam dike û her diçe Josef K. ji aliyê psîkî ve dihêrive. Bi rengekî ji rengan ew bi nexweşiya wan dikeve, lawaz dibe, nizim dibe û dikeve sewiyeta wan. Her kes li wir weke ko karmend bin xwiya dikin, di nav wan de, yê ticaran ne li bîrê, wek nimûne neqîşvanek û çend pûştên ko bi temenê xwe gelekî piçûk in. Dawî her tişt berbi şaşîti û xirabyê ve diçe, karê Josef K. li bankê, têgehiştin û girêdana bi rastiye

re û pîrsa hatina dadegehê, ew nema li ser sedema tawankirîa xwe jî hizir dike.

Di deriyê ber dawî de ji pirtûkê ew bi korfelaqiyeke ji aliyê dadegehê ve baş plankirî pêrgî keşayê dadegehê tê. Keşa li ber xwe dide, da ko bi alîkariya serpêhatiyekê jê re armanc û mebesta proses û dadegehê şirove bike. Pirtûk bi vî rengî tewa dibe: Josef K. weke sewlekê tê gurandin û tiştê dawî ew dibîne bê çawa celad wî bêrûmet dikin.

Di despêkê de dema Josef K. li ser xwe bû simpatiya mirov dikişande bi ser xwe de, lê di dawiyê de bi tenê dilê mirov pê

dişewitî.

Mebesta pirtûkê ji prosesê dadegehê mezintir e. Weke ko ez têgehiştim, ew dixwaze du tiştan bibêje:

Ya pêşî ji ber ko Josef K. bodîle û kelêj e, wî mafê xweyî jiyanê windakiriye. Yê hêjayî jiyanê dive biserketî be û di ser sînoren rebenî piçûk re be. Lê dadegeh e, ya ko wî dixê nav vê rewşa aloz de. Dadegeh dikare derbibire bê di jiyanê de bextê her kesekî çi ye, lê ji ber sînordariyê ew gelek caran ji guh tê avêtin.

Ya dudyar dibe ko ew parodyaya (zalîkirina qeşmerî) bi tevayiya civakê be û bi pêvajoya nexweş ya ramana wê be. Dive mirov di qalibên civakê de be, yan na, wê civak wî biperçiqêne. Ev jî dike ko hin serê xwe dideynin û ew jî dibine yek ji nav garanê, yê vê neke tê hêrtin û avêtin.

BERBISK



Keça Kurd

1
 Berbiskên helbesta min windane
 Ji xuhdana têkoşerî gelek dema
 Reşka çavên hemî xema
 Helbestekê tevna xwe ya pîroz çinî
 Li beroja serketina dixemilî
 Rengê xwe da çol û çiya
 Di bergeha serbestî de
 cihên piyên xwe çêdikir
 Li ber ava şaristanî hat û çokir
 Biska rojê li anîka wê zer dikir
 Di asmanê şanazî de estêrekan
 li pey heyvê li berbanga dimiçiqîn
 Dê mê zevî
 ji bo xemla vê helbestê
 nimêjkirin nimêjkirin

Pîrejina dayika şehîd piştî xwe da
 warê şîn û derbiderî
 Li çîroka bêçariyê derî dada
 wê bexçika êş û jana
 li bin serê şehîdekî nenaskirî binax
 dikir
 wê kovanên cerg û dila bi xweş
 gotinên

vê helbestê pînedikir
 dilorand û axa ziwa li ser sînga
 goristanek
 wê şildikir
 ji bo taştê firavîna biçûkên xwe nan
 dipêje
 zersimbilên liqata par serkutdikir
 lê nedêra û jê nexwar
 Babelîsoka gunehkarî ji başûr û ji
 bakur hat

2

Liqata par û ya pêrar talan dikir
 Pîrozgeha perlemanî kelha kurdan
 dihêrivî dîwar ketin
 Gulbişkojê nû hêviyan ên xwezîyan
 di gerûya azarî de
 xwe dikuştin xwe dikuştin

3

Heyvê barkir
 di xurçika hewravekî reştênî de
 Rûyê sipî xwe dipoşa
 êşa salan pelû dikir
 Li ser laşê seretanî derda
 min nezani
 li beyarê bêbextiya
 quloçên berberîyan şax vedane
 neperûşkên kîneberî dirêjbûne
 dixepêrin çavên sala,
 kujyên dema
 Divêvirîn ji nû reşkavolî xeman..
 Min go çima
 Li pencera başûrî dil
 vê kevokê ser daniye li ser xema
 li hêlîna xwe nebane
 Min nezani
 Welatekî bê demsal e
 Buharekî gulkujêne
 Min nezani
 Ku berbiskên di helbesta
 min windane

950801

Nameyeke kevnênû ji torîna şengepîroz re

Ismaîl Taha Şahîn

Torîna min!

Torîna xewnrojken minê rûtek
mebêje

kî dê serê xwe dante:

Ser balîfken serê te

Te ez bivêm, te ez nevêm

Ne tu dişêyî bijî bê min

Ne ez dişêm bijîm bê te.

Evîndarên helmeke bayê
evînê

Evîndarên kul û kamên
serwinda

bi germî ji min hez dîkin

Serkirînkên stûyê şêran
diqirînim.

Çavê rûviyan dialîsin

da xemên terxanan pê
verevînim.

Ne şîyan bi darê zorê

min ji dil wan derxînin.

Ez çavekî darkirî me ji
rûndikan

Hêviyeke benestû me
na xendiqim.

Torîna min!

Dema ax dibête hilm

Hebûn hemî li ber min dibête
ax

Nawiska evîndarên wêvetiran
min pê çêbit

Nahêlime sax.

Were da em destgerdenî hev
bibin.

Da rastî hêlînka xwe

di sîngê me de ava kit.

Li kinarê dilê me biêwirit

Xwezîkên me

li mêrga evînê biçêrin

Da ferhenga zimanê me

pişt li ferhenga peyvan nebitin
hevdijan li hev neêxit

axaftinan varê nekit.

Da ez û tu di bin saya evînê
de

bibine serek

serên bê ser

xwe pê bigirin

Di kirasê vîna me de

zencîra koledariyê bibizdînin

Koledaran bin çok bikin

Kamên kûvî vehewînin.

Axa bin pê te pîroz kin.

Şenge Torîna pîroz!

Ne şayî pîroziyê ye

ji min dûr bî

ji te dûr bim.

Di gewriya min de naçit

her ro dêwekî guhderzî



talûqê canê te bibit
 di bin kerb û kîna wî ve
 şev û rojan bilerizî.
 Torîna min!
 Ji deziyê zuha pêvetir
 di guhê min de nîn e.
 Xemla bihara dilê min
 bi viyana te her şîn e.
 Di pîstê bêdengiyê de
 sing hilkêşan
 ho li mirinê mijûl kirim.
 Kirtêna danê duker
 di mala min de nehêlan.
 Xwezîkên min şipne kîrin
 Yan ji tevê xweştir ew e
 ez nemirim.
 Torîna min!
 Lêmişteke kovanan da ser
 êminiya dilê min
 Ew lêmişt bû xencerek
 kamên tînê serjêkirin .
 Barûvên kerb û kîna reş
 evîndarî kire mirin
 çinku piştî xwe nadime
 mirovê di sîngê min de.
 Hêviyên tînê avdidit
 Di bin çadira xweşmirovîyê
 xwe diqelêzte riha vînê
 bo mirina min
 barove û lêmişt pê xîrin
 lê namirim.



BENDEWARIYÊN SPÊDEKE TEVİZÎ

Hoşeng Broka



Wê spêdê...
 Hîna zû
 bi helçinandina gwîzikên pembo re
 te ahînokêd xwe yên lal,
 sozên li ber bayê,
 paytextên ingirî,
 li ser textikên ko bi talanan
 xwedîkirî
 yeko... yeko
 dipelixandin
 û dilketîkê te nehat!
 Bêrîkirinên tozê
 ji “ memikên êşê “ re
 li ber pêlên zaroktiyek ji tozê
 ji boyî tozê
 te keritand
 û dilketîkê te
 nehat!
 Hemî welatan/ Awazan
 bi viyana te
 xwe kuştin
 xelmaşîya rojavayekî kêrdayî
 di kefenê tixûban de
 te

h
 e
 d
 i
 n
 a
 n
 d

û dilketîkê te
 nehat
 û nehat
 û nehat!!

WERGERANDINEKE BIJARTÎ JI PIRTÛKA

"DAXISTAN**WELATÊ MIN E"****YA RESÛL HEMZATOV***Wergêr: Samiyê Ehmedê Namî*

Bê çawa çiya tev bi dîmenê xwe nêzikî hev in, bê çawa kulîlkên çiyayê tev bi malbat, reng û naziya xwe nêzikî hev in. Wîlo jî kes û gelên çiyayî bi surîşt, rewş û psîkolojiya xwe nêzikî hev in. Û jî ber ko min rewşa xwe (ya kurdan), bi kêmanî di hin redeyan de, di pirtûka nivîskar û rîstevanê Daxistanî, yê bi nav û deng Resûl Hemzatov de "Daxistan Welatê min e", peland. Min xwest dilê xwe, li ser zîmanê wî û di rîya heyberên wî re, jî we re vekim.

R.Hemzatov dibêje:

- Gava helbestevanên xort helbestên xwe jî bavê min re tanîn, berî her tiştî wî li xêzên wan dinêrî. Ji ber zargotin dibêje: *Cotarfî jî xeta cotê xwe xwiya ye.* Paşî şaşiyên wan rast dikirin û rastnivîsa wan bi serûber dikir, wî serê xwe dihejand, weku bibêje: Xwe hînfî nivîsandineke rast bike. Hin xortan sirincokên xwe bi fedîbûn diyar dikirin, ko "Homîrosê sedsala bîstan" jî kewden bû. Bavê min digot: Min ev yêka nîzanîbû?! Min ev "Homîrosê" xort nedinasî.

Yên wekî wan hîna li Daxistanê pir in. Bavê min bi hebûna şaşiyên rêzîmanî jî di rîstan de zîşt dibû.

Her kesê ko bavê min dinasî, weku diyar bû, li gor xwe lê dinerî. Helbet wî cot dikir, geya diçînî û li erebê bardikir, hespê xwe av dida û lê siwardibû. Min tim didît, ko pirtûka wî di destan de ye. Pirtûk wîlo digirt, weku çûkek pê re be, û tim bixwaze jî destên wî bifire. Bi ser ko jî mêvanan hes dikir, tim bi windabûn û aloziyê dihesta, gava dihatin ba wî û ew jî xwendinê mijûldikirin, te digo qey wî jî limêjeke girîng dîr dikin. Û gava bavê min dixwend, diya min li ser sertiliyên xwe dimeşî û tiliha wê tim li ser lêvên wê bû, da tenha em bi kurte-pîst bipeyiv in. Harbûniyan nekin, bavê we kar dike! Xweş dinasî, ko xwendina pirtûkekê, li ba torevan, karê wî ye. Wê bi xwe jî nedîwêrî derbasî cem bibe, da binêre ka tiştek gerekî wî ye, ka hîbir di diwêtê de ma ye. Bi rîştî tim guhdarî diwêta bavê min bû, nedîhişt ziwa bibe. Eger du rojên geş di jiyana bavê min de hebin, ew jî jê re anîna pirtûkan e, pirtûkên ko wî dixwend in, û pirtûkên ko dinivîsandin. Tucarî daxwaza kesekî, eger çi bûna jî, nedivegerand. Didît ko gotina 'nîne' gava 'heye' mezintirîn derew e û girantirîn gunehkarî ye. Rewşa wî çarereş dibû, gava pirtûkeke ko wî jê hes dikir jê dihatê xwestin. Pirtûk dikete destên nivîskarê xwestî de jî lê hîna herdu destên bavê min bi hêla pirtûkê de dirêj dibûn. Û gava ko pirtûk demeke dirêj li ba yê xwestî dima, bê ko wê vegerîne, bavê min jê re dinivîsand: 'Min pir bêriya wî hevalê xwe, yê te bi xwe re birî, kirîya. Gelo, bi vegerê mijû nabe?'.

Digot: 'Nabe tu rîstan binivîsî û nikaribî wan jî dê, keç û xwîşkekê re bixwînî. Ez ti tamê di filimên ko sîpên

kêmi şazdesalî ji dîtina wan dûr dikin, nabîn im'.

Kêfa wî ji nivîsandina bêkêr re nedihat. Û carekê namek ji hevalekî xwe yî kevn wergirt, name bi zimanê erebî, bi bêkêrî hatibû nivîsand in. Bi qerf jê re nivîsand:

Tîpeke te daholeke çiriya ye, Xal di nava wê de ferşekî giran e. Ya din jî avayîke ban hêrivî ye, Tenha sitûnek jê ma ye ko nehêle bi tevayî biherive. Û hîmekî mezin ev tîpa belengaz perçiqandîye. Tu ji min re nabêjî te çawa ev hîm bi ser de gindirandîye? Te kumê tîpa çaran heta bi birhan xwar kiriye. Her xêzeke te rûpelekî dadigre. Gelo, tu ji xwe re mijûl nebûyî, ko di şûna pênivîsê de neperûşkên pisikan bi kar binî? Tîp weke dareke pirşaxe, û rûpel weku daristaneke ko bagerê lêdabe, û tevrikê darbiran tê de gêre kiir bin. Seyre: Ma tu li ko fêrî vê nivîsandinê bûyî?

Hingî, pir kes ji van malikan ingirîn. Hin ingirîn ji ber ko tê negihîştin, û hin ji ber ko xweş tê gihiştin. Hin bawer bûn ko Hemza qerfên xwe ne bi nivîsandina tîpên erebî bi kirêtî dike, lê bi kirêtiya tîpan bi xwe dibe. Lê tucarî ne dikete bala bavê min de, ko rexnê li tevaya elfebayekê bike. Kevir tavêtin bexçê wan kesên ko elfeba çirûk dikir in û yên ko nizanibûn bi spehîtayî wê pêk binin. Mirov dikare bi gelemperî bêje ko bavê min ti elfeba bi nebaşi neanîne ser zimên. Lêbelê çavên wî bi wan kesên ko dev tavêtin elfebayan bar nedibûn. Digot: 'Ereban êrîş berdane Daxistanê, ev rastiyeke e, lê ti gunchên nivîsandin û pirtûkên erebî di vê yekê de nînin'.


Bavê min di pirtûkxana xwe de, nêzikî pirtûk û pênivîsên xwe, nêzikî pelekî nivîsandî û yekî spî, nenivîsî, rih spart. Çi pê ve ye, wê hine din wî pelê sipî dagrin. Daxistan fêr dibe, Daxistan dinivîsîne. Niha, ezê serpêhatiya

fêrbûna xwe ji we re bibêjim. Ya rastî, çawa li min bar kirin da ez fêr bibim. Hingî, ez pêncsalî bûm, Daxistan bi tevaya xwe li pişt masên xwendinê dirûnişt. Dibistan, xwendegêh û kolece yek li pey yekê vedibûn. Pîr û zarok, jin û mêr, fêr dibûn. Pêşvebirineke rewşenbîrî pêk dihat. Pirtûka min ya pêşî di dibistanê de li bîra min e, wilo jî defterên pêşî ko bavê min ji min re kirî bûn. Wî bi xwe berê xwe ji gundekî dida gundekî û doza fêrbûnê dikir. Elfebeyeke mû belav bû. Bavê min ew bi germî pîroz kir. Tim ji nava xwe diêşa, ji ber Daxistan dûrî kultura Rûsî ya payabilind bû, ji ber ko elfeba nebû. Wî digot: 'Daxistan parçeyek e ji welatê me yê mezin. Pêwîst e li ser ko wî binase û mirovaniyê jî pê re, pirtûka jiyana mirovaniyê bixwîna û wê binase'. 'Rêke nû ye', 'Cihanek nû ye', 'Mirovin nû ne'. Ev awaz û sîmbolên wan rojan bûn.

Bavê min zarokên xwe ber bi van awazan de rê dikir in, ber bi awaza dema nû de. Ne hesan bû ji nûbûnê re, ko riya xwe veke. Pîr bûn, yên ko kuç û kevir dixistin riya vê nûbûnê de. Gelek pencerên dibistanên nûvebûyî hatin şikandin. Dijminên fêrbûnê digotin: 'Ev çi zeman e, ko şivan tê de pirtûkan bixwîne, ko qeraş tê de dersên xwe ji ber bike?'. Erkên wan guhdana pêz e û hêrtina arvên e'. Û serbûriyên xirabtirin peyda bûn. Tê bîra min, çawa guleya tivingê ya berê wê li mamostê bû, li karta (xerîta) bi diwarê dibistanê ve daleqandî ket, û di vê bûyerê de bavê min çi got: 'Kirî vî tawankarî cihan bi guleyekê qul bikira'.

Berî niha kesekî di gund de, pêvî melê, nikaribû namekê yan pirtûkekê bixwîne. Niha herkes pirtûkan, pêvî melê, dixwînin. Ev mîletê biçûk xwedanê hebûneke mezin bû, û hîna çîroka Daxistanê tê nivîsandin. Dawî ji vê dîrokê re nîne û nabe ko jê re hebe.

JI DÎMENÊN CENGA MEZIN*



Sebrî Botanî

TOPA SULTANÎ

I

Bi gotina apê xwe bikin, hûn poşman nabin, werin herin Wanê û Gola Wanê, herin Bedlîs û Tetwanê, herin Qars û Erdehanê, herin Nemrûd û Sîpanê Xelatê, herin Agrî û Araratê... Herin ji xwe re çiyayên bilind û şaşikspî, kelehen mezin û dêrîn bibînin. Her kelehek ji van kelehan hezar tiştan dibêje. Li hindav û nêzî Wanê û Gola Wanê kelehen mezin û dîrokî hene, du keleh ji van kelehan li raserî lêva golê ne, herdu jî li ser tatên pan û mezin hatine nijandin, mîna bajaran e û jêrê wan şkeft in, her şkeftêkê çend dergehê hene. Ko mirovekî şareza wan dergehan dibîne, di cihê xwe de şaş dimîne û bi çirîset ji xwe dipirse: gelo vekirî ne an daxistî ne?!

Di van şkeftan de nawîskên kolayî hene û bi diwaran ve jî dergehên daxistî û pencerokên corcor û ne wek hev hene, piştî wan jî tat e. Li ser banên du şkeftan nîşgehên wek hev û yek endaze hene. Lê ko hûn diçin vê geryanê, an vê geşt û sêranê, Adilcewazê ji bîr nekin.

Ya ko li ser qeraxê bakurê rojavayê golê dikeve, da hûn wêneyên kevnar û entîk li ser nehîten keviran bibînin. Herweha pêvî ye hûn dêra Axtamarê jî bibînin, ya ko li ser giraveke golê hatiye avakirin. Herin, li xwe nekin derengî, hemû dîmenên devera Wanê delal û spehî ne. Herin ji xwe re wan hemû keleh, şkeft û nawîskan bibînin, da hûn bîponijîn û hişê we bi paş ve vegere. Dastan, efsane û çîrokên berî hezarên salan bîne bîra we, ko hemû di binyat de, hindî, kurdî, ermenî, farisî, aşûrî, grêkî û azerî ne û di nêvşêniyê devera Wanê û yê hawîrê gola Wanê de belav bûne. Giyabûk, Xewna Şivanê Koçer Badoşê Çeleng, Hespê Xidir, Elyas û Tajîyê wî, Mîrê Maran, Mîrê Cinan, Keça Mîrê Cinan, Kelagameş, Kurê Zalê Zêrîn, Pîra Miroxwer, Memê Alan, Xec û Siyamend, Koroxlî, Topa Sultanê Îslamê û hwd; ko heryekê ji bûyerekê an ji xeyala kesekî peyda bûye. Ji gotina Mela Cemîlê Batûvî, ta ko zimanê kurdî ji aliyê dewleta Ataturk ve nehatibû qedexekirin, nav û naverokên van hemû dastan û efsaneyan di mal û diwanxaneyên kurdan de, nemaze di diwanxaneyên beg û axan de, dihatin bihistin. Sê ji van efsaneyan xwemalî ne, yanî li devera Wanê afirîne, Giyabûk, Xewna Badoşê Çeleng û Topa Sultanî. Heçikê efsaneya Giyabûkê ye, ji gotina giyanasê mezin Hevindê Habil, dendikek ji tovê wî giyayê nazik û pîroz, di nêv pirça serê dayika me Hewê de ji behîştê hatiye ser dinyayê. Lê heçikê Xewna Badoşê Çeleng e, çîroka wê dirêj e û pir bi sam û çirîset e jî,

guhdar bi bihîstina wê sewdaser dibe. Ev herdu efsane kevintirîn efsaneyên vê dinyayê ne. Em dê nuha dev bi gotina efsaneyê Topa Sultan bikin, ew topa ko despêka wê bi derewan hatibû afirandin, bi devê sofî û derwêşan hatibû pîrozkirin û xelkê nezan pê hatibû xapandin. Lê pişka dûmahîkê hemû rastî ye û pirr kesan ew top û hem bûyera wê bi çavên xwe dîtine. Gelo çiman ev çîroka rast û derew hatiye ji bîr kirin, êdî ji sala 1917an ve ti kes navê wê lêv nake!

Çu kesî nedizani û nuha jî min ne bawer e kesek bizanibe, ka kengê û ji zemanê kîjan Sultanî ve topeke mezin, ker û lal, li ser çiyayê Zer raserî gola Wanê swar kiribûn. Êdî ji hingê ve, nav û dengê vê Topa Sultanî bi saya "telqîna" hindek ji şêz û melayokên me kurdan, welat dagirtibû, her sofîyekî, her derwêşekî û her murîdekî, bi navê şêxê xwe bi fermana wî, tiştê gotiye û ji cem xwe jî berdaye ser.

- Cin dadigrin û firîşte dîteqînin.

- Xelata Xwedê ye ji Sultanê Îslamê re sandiye.

- Kilîla karkirina wê bismilaya devê sultan e.

Êdî bi vî awayî sal bi sal û nîş bi nîş bawerî pê anîne û di hizra wan de bûye wek rastiyeke. Ev rastiya bêbinyat bûbû qajik di devê xelkê nezan de û wan jî mîna derwêş û sofîyan bi serê şêx û bi goristanên meşayixan sûnd dixwarin ko ev Topa Sultanî bi bismilaya devê sultan kar dike. Goya her bi saya vê topê ye ta nuha ev rexê dewleta Alî Osman maye parastî.

Lê ev gotinên hîç û pûç bê bersiv nediman, pir kesan digotin derew e. Hunermendekî gotibû ko "bismila" her "bismila" ye, çi ez bixwînim, çi sultan, an kesekî dîtir, ma gelo ferqek heye? Ji ber vê gotina wî, derwêşan ew bi dar û biviran kuştibûn. Yekî cuhû jî gotibû ko "Ev Topa Sultanê me bi makîneyeke

biçûk kar dike, ew makîne di qotiyekê de ye, ew qotîk jî di hundurê gustîlkekê de ye, ew gustîlk di tiliya sultanê me ya qilişkê de ye. Di tengasiyan de çi gava ko sultan hez bike, sefa gustîlkê radike û niklokê wê ê bi mengene badide, hingê bi hêza magnetîze ji Stanbolê, dê ew topa li ser çiyayê Zer, karê xwe bike. Ev gustîlk ji sultanekî bo sultanê di pey wî re dimîne. Cudahiya di navbera gustîlka sultan û gustîlka Silêman Peyxember de ew e ko ya Silêman Pêxember diyariya mîrê cinan bû, lê ya sultanê me karê destê hostayekî dinyayî ye."

Hingê, piştî bihîstina vê gotina zîlamê cihû, şêxekî navdar û xwedî "keramet" xwe neqayil kir û çavên xwe nuqandin û hûrik hûrik xwe ponijand, paşê navê Xwedê anî û got:

- Gelî musulmanan! Evî zîlamê cuhû viyaye bi wan gotinên xwe ên şaş û derew rastiya dinê me vajî bike. Ev gotinên wî ji rastiye dîr in, rastiya vê topê "Îlmê" wê li cem Xwedê ye.

Ji Xwedê û qencên wî pêve kesek di pê nîzane.

Piştî vê gotina xwe, şêx çavên xwe vekir û serê xwe hejand û got:

- Lê belê ez dikarim bibêjim ko ev Topa Îslamî, ya ko li ser çiyayê Zer e, ji hêza "qudretê" ye, ya leşkerê "lem terew" bi xwe ye.

Êdî Nefiyê Erzeromî, şairê navdar û zimantûj li hember van gotinên şêx bédeng nema û got: - Ey xelkê nezan û gêj, guh nedin şîretên vî şêxî, ser û binê wî bela ye, ew patoxwerê Şêx Yehya ye. Heydê werin, rastiya vê topa xaqanî ji devê min bibîhsin; barûta wê ji teşna sultanê me ye û dagirtina wê bi destê Şêx Yehya ye.

Ko evî şêxê xwedî derwêş û xwedî "Keramet" ev gotina Nefî Erzeromî bihîst, pir xeyidî û nivîsek dirêj bo Şêx Yehya nivîsand, herçî xirab e, çi rast, çi derew, wî di derheqê Nefî Erzeromî de

danî ber destê Şêx Yehya. Hiş di serê Şêx Yehya de namîne û demdes diçe Babul-Alî û sultan agehdar dike:

- Ey sultanê musulmanan! Ey xaqanê bej û avê, bizane ko Nefî Erzeromî xezeba te û ya Xwedê jî li xwe helalkir. Gerek e sezayê xwe bistîne, da kesek dî çav li wî neke.

Sultan jî diranên xwe disîrîkîne û demdes biryara kuştina Nefî dide û dibêje: Wî kafirê ehmeq Nefî Erzeromî, hêdî hêdî bi eşkencê bikujin.

Wilo kirin jî. Dibêjin di ber kuştina xwe re Nefî gotiye:

- Ez mirovekî bextewer im, çunkî ez di hemû jiyana xwe de dijminê zor û sitema sultan û derewên şêxên sextekar bûme.

*

çîrîset = heybet, saw

pêvî = pêwîst

patûxur = Nanê hişk yê ko di tenûrê de dişewite.

demdest=yekser


Têbînî

Ji vê hejmarê û şûn de; dê seydayê hêja Sebrî Botanî xwendevanên Dugirê bi bîranînên şervanên kurd ên ko beşdarî şerê cîhanê yê yekem bûbûn, dolmend bike.

Di nav xêzên van bîranînan de, dê gelek agahdariyên balkêş û nebihîstî, bîn ragihandin û şeweyê nivîsandina rewanbêjane yê seydayê Sebrî Botanî dîmenên vebêjiya bûyeran ciwantir bike

Dugir

ASO



Kamîran Hersan

Kevir bi kevir, tenhatiyê li ser milên xwe hildigirim..
Kêlîkan dinejinînim..

Êşê vêdixim,

û silavê li rondikan dikim..

Dema min winda bû,

li paş girên bîrîkirinê xwe veşart.

Wek avê bi ser qûma tenhatiya min de rijiya..

Sînorên rojan sergerdan bûn

Çurîskek , ronahiyek diyar bû û ber bi nemanê de çû..

Yê ko şîniya terr ji labîrênta çavan çiniye, ez bûm.

ji destên te yên ko di asoya hişê min de avjeniyê dikin

Wek hetavê tu ji zeviyên hevdîtina min winda bû yî..


bi ewran û bi mijê qirêj bûm

Wek asoyê ko keskesorek jê diket û çûk dişikyan

pîr bûm.

DEWLETA DOSTIKÎ

III



Fehedê Mustefa

Sultanê Selcûkiyan şandeyekê dihinêre cem Nasir Eldewle, da ko tizbiya bapîrê xwe Nesir Eldewle û şûrê Mîr Mûsk(11) wek diyarî ji Sultên re bişîne. Nasir Eldewle jî vê daxwazê napejirîne û daxwazê bixwe jî hem wek bêrûmetiyeke şexsî û hem jî kêmasiyeke niştimanî dibîne. Herwiha Nasir Eldewle jî bo vê helwesta çewt a Sultan şandeya wî dest vala bi ser wî de vedigerîne.

Wexta ko Sultanê Selcûkiyan jî alî şandeyên xwe ve li ser helwestên Mîrê Dostikiyan têt agahdarkirin tore dibe; û torebûna wî jî gurtir dibe dema ko dibihîze, ko Nasir Eldewle ne tenê tîzbî û şûr diyarî wî nekirine lê xutbeyan jî nema ne bi navê Sultanê Selcûkî û ne jî bi navê Xelîfeyê Ebasiyan dixwîne; lê bi navê xelîfeyê Fatimî dixwîne.

Di bin bandora van bûyeran de û bi piştigiriya xelkên li dora Sultên, yên ko bi çavnebarî û zikreşî li dewleta Dostikiyan temaşê dikirin û çavdêrî û bendewariya hilweşandina wê jî dikirin, Sultanê Selcûkiyan Melekşah dest bi êrîşa xwe dike û hêzên giran berbi sînorên Dostikiyan ve dihinêre, û bi alîkariya hemî dewlet û mîrekên navçeyê (nêzî sala 1083 PZ) welatê wan dorpêç dike.

Li beramberî êrîşa Selcûkiyan û alîgirên wan, Kurdên Dostikî şîyan sirûdeke bêmînak di qada berxwedanê de birêsin û pêdariyeke lehengane jî bo parastina sînorên dewleta xwe biafirînin.

Lê piştî ko abloqe û dorpêçkirin diwartir dibe Mîrê Dostikiyan digel çend girgirên dewletê berê xwe dide paytexta Selcûkiyan Asfehanê da ko, hem guftûgoyê û hem jî lêbûrinê ji Sultên bixwaze; reng e bi vî awayî bikaribe welatê xwe ji sosret û jî malkambaxiyên şerî bi dûr bixîne.

Li Asfehanê Sultanê Selcûkiyan xwestiye bi Mîrê Dostikiyan re bigihêje peymanekê ko bikaribe dewleta Dostikiyan di nav xwe de dabeş bikin; lê Nasir Eldewle vê pêşneyara Sultên bi şûn de vedigerîne û jê re dide xuyanîkirin ko li ser bostekê ji xaka Dostikiyan bazar nayê kirin. Ev helwesta Mîr a li dijberî Sultên di bin bandora namekê de ko nû ji wezîrê xwe yê fileh (Ebû Salim Eltebîb) wergirtibû, hatibû çekirin. Di nameyê de yê wezîr dide şirovekirin ko em dikarin sînorê xwe biparêzin û hetanî çend salan jî li dijî êrîşê rawestin.

Piştî salekê; yan jî piştî dorpêçkirina dijwar û hovane ya ko salekê sax dirêj kir û ajot, keleh û sûr û asêgeh û gund û bajar û çeperên Dostikiyan yeko yeko, bi dû

hev de, hilweşîyan û dawîya wê jî Miyafarqîna paytext dikeve destê leşkerên Selcûkiyên êrîşker.

Ko bajar hatin dagîrkirin Selcûkiyan dest bi kiryarên dirindane û wêrankirina dezgeh û vemayî û şaristanî û talana aborî, kirin, û ya jî tevî xerabtir ew e ko Selcûkiyan di cuh de fermana kuştinê û dîlkirin û talanê bi karanîn, serjê-kiringeh û xwînrijandin û bobelatên bêrûmet bi serê Dostikiyan anîn; bi taybetî bi serê Kurdên Fileh ên ko di bin siya perên Dewleta Dostikî de bi aşîti û dîlşadî û aramî dijiyan; û bi dilsojî xizmeta dewletê dikirin.

Xala herî balkêş a vê berxwedanê jî ew e ko di sala dorpêçkirinê de ti tevlihevî û nakokiye navxweyî di navbera Dostikiyan de neqewimîne digel ko Mîrê Dostikiyan li Asfehanê bû û nikarîbûye vegere û serkêşiya gelê xwe bike.

Nûçeya herîfina Dewleta Dostikî digihêje Asfehanê û Sultanê wê yê ko dilê xwe bi Mîrê Dostikiyan dişewitîne û dixwaze barê têkçûnê jî ser milên wî sivik bike lewra jî Mîrê Dostikayan dixwaze ko mîrlikekê jî bo desthilatiyê li derveyî welatê Dostikiyan jî xwe re hilbijêre. Nasir Eldewle bi van gotinan bersiva pêşniyara Sultên vedigerîne: Ji bilî singoyekî (herbayekê) ko aniha di sînga min de daçikiya ti tiştî naxwazim. Hin jî dilxwazên Mîrê Dostikiyan ên ko li civata Sultânê Selcûkiyan ê ko bi zimanê erebî baş nizanîbû; jî Sultên re revakirin û gotin: Ew Herbayê dixwaze padîşahê me!

Bi vî rengî Nasir Eldewle dibe xwedanê gundê Herbayê(13).

Hilweşîna Dewleta Dostikî

Em dikarin hilweşîna yekemîn a sala 1084 an PZ a dewleta Dostikî ji ber van sedeman ronî bikin:

1- Dolmendiya dewleta Dostikî.

2- Jeografiya balkêş û stratejî ya dew-letê.

3- Jihevketin û neyekbûna mîrlikên Kurdan (Rewadî, Salarî, Dostikî) li hem-berî êrîşên Selcûkiyan (14).

4- Hêzariya leşkerî ya Selcûkiyan û pişgiriya hemî dewletên dîtir bo wan.

5- Neşarezayîya Nasir Eldewle di warê siyasî de, digel ko niştimanperwer bû.

6- Dadperweriya dewleta Dostikî û jiyana bê olperestî ya hevbeş a di navbera hemî olan de, hem ne li gorî kêfa olperestên hundir bû û hem jî deshilatên derûdorê ji veguheştina vê forma xweşik û lihevhatî ditirsiyan.

7- Neşandina tizbiya Nesir Eldewla û şûrê Mûsik bo Sultên û nexwîndina xutbeyan ji alî Mîrê Dostikiyan bi navê Sultanê Selcûkî.

8- Nîrxandina şaş a wezîrê fileh Ebû Salim Eltebîb a li ser şiyana berxwedanê.

Bi vî awayî mirov dikare sedemên têkçûna yekemîn a sala 1084 an a dewleta Dostikî bine zimên. Lê belê di wê wexta ko Nasir Eldewle li (Herbayê) dijiya, Melekşah dimire, ew jî vedigere welatê xwe û bi alîkariya gelê xwe hemî keleh û bajar û asêgehên Dostikiyan ji destê Selcûkiyên ko piştî mirina Melekşah bi şerê di navbera Teteş birayê sultan û Birkiyarok daketibûn, vedigerîne. Lê wek me berê gotibû, lawaziya Nasir Eldewle ya siyasî û helwestên wî yên dijîminatîyê li beramberî Selcûkiyan bi taybetî li dijîberî Teteş û neavakirina peywendiyên tekûz bi Birkiyarok re, bûne sedemên herifin û têkçûna diwemîn û ya dawîn a dewleta Dosyikiyan, ko li ser destê leşkerên Teteş, ko di sala(1086)an bi xwîn rijandin û kuştin û talan û bi hovîti û şewitandina her tiştî jî nû ve welatê Dostikiyan dagîr dikin, û bi vê dagîrkirinê, piştî 104 salan, helbesta dewleta Dostikî ya kurd bi perdeyê têt nixumandin.

Têbînî:

- 1- Bad: Dibêjin ko en nav ji bê hatiye. Ango mîna bagerê êrîşê dibe ser dijmin û vedigere, wek ko Ebdulreqîb Yûsiv di pirtûka xwe ya li ser dîroka dewleta Dostikî de dibêje.
- 2- Li ser vê xalê dîrokzan ne wek hev diramin. Hin dibêjin ko di destpêkê de Wan vekiriye û hin dibêjin ko Ardêş e.
- 3- Di pirtûka Dîroka Miyafarqîn a Ebû Elezreq Elfariqî de hatiye zelal kirin.
- 4- Ibin Elesî Elcezerî, Elkamil Fî Eltarîx, cildê 3 yan.
- 5- Elmeqeryosî, Tarîx elislam Elsiyasî (beşê diwem). Elfariqî(Dîroka Miyafarqîn).Ebdulreqîb Yûsiv(Dewleta Dostikî), vê xalê bi cî dikan.
- 6- di pesindana Nesir eldewla de

النصار باد بأرجيت و بغيره
 بوصول الزمان من عراب
 بجاء الزمان دليلاً منه
 حكمة كنهية ليزيد من كرم

- 7- Ibin Elesî û Elfariqî û Ibin Kesî Eldîmeşqî vê diyardeyê diçesibînin.
- 8- Wek Ebû Salim Eltebîbê wezîr.
- 9- Elfariqî û Ebdulreqîb Yûsiv.
- 10- Dibêjin ko bihayê tizbiya Nesir Eldewle 200 000 dînarê bîzantî bû. û şûrê Mûsik şûrê Mîrê kurdê Botî Mûsik bû. herwiha dibêjin ko deve li ser wî şûrê dimeşyan, reng e ev ji ber panbûna şûr bi xwe tê.
- 11- Elfariqî û Ebdulreqîb Yûsiv.
- 12- Herba gundekî mezin e li nêzî Bexdayê dikeve.
- 13- Liserrawestaneke taybetî bo vê xalê pêwist e. Reng e siyaseta navxweyî ya dewleta Dostikî ya li dijî olperestiyê, hiştibe ko, mîrlikên kurdan ên olperest dûrî wê herin.

Çavkanî:

- 1- Ibin Elesî(Elkamil Fî Eltarîx - cildê sisiyan).
- 2- Ebû Elezreq Elfariqî(Tarîxa Miyafarqîn).
- 3- Ebdulreqîb Yûsiv(Dewleta Dostikî).
- 4- Ehmed Emîn Zekî(Elîmarat Elkurdiye Fî Elehd Elislamî).
- 5- Daîret Elmearif Elislamiya, Cildê 9 an.
- 6- Merwan Elmûdewer (Elermen Ibre Eltarîx).
- 7- Jan Mikêl(Jugrafya Elislam Elsiyasiya , cildê 4 an).
- 8- Ibin Kesîr Eldîmeşqî(Elbîdaye welnîhayê, Cildê 3 yan).

WEXTA KO

Helbest: Ehmed Huseynî
Wêne: Rehîmo

Bo Yihya:

*Tê bîra te wexta ko me ji bîr nedilîr ko em zarok bûn, tê bîra te aniha
wexta ko em zarok in...?!
nebî-nebî zaroktiya me, li welatê mişextî û mirinê, biderize!*

I

Wexta ko min
bi agirê girrê girên te,
xetîreya berbanga mirî,
xemgîniya serserî,
xweliya xewnê û sistegavên kerî,

v
ê
d
i
x
i
s
t
i
n

Wexta ko min,
bi teşiyên dastana girî,
Velerzîna destên te
Velistina hestên te
Veguhestina darbestên te
Di navbera xwe û goristanên birçî de
Wek pirên xatirxwestinê,
Wek çemên dîlok-ristinê,

r
a
d
i
x
i
s
t
i
n.

Wexta ko min,
 bê ximav û bê perî,
 şaneyên kulên te,
 sînorên hişyar ên her çar dilên te,
 rakêşana awirvedanên mêrkuj ên kilên te,
 û pêlvedana bîranînên şewatê
 di kêferata peyvên zuha de,
 di reşgirêdana kulîlkên hovane û
 di ferhenga tozgirtî ya reha de,
 di kelkela çîninê û di seridandina ceha de,

d
i
r
i
s
t
i
n.

Wexta ko min
 heyva bîrtûj a bobelatê,
 dilsariya stêrkên rijyayî yên esmanê çavên te,
 çelmişîna kewên tîmayî yên hêlîna lêvên te,
 bi ser serê gējahiya evîndaran de

d
i
x
i
s
t
i
n.

Wexta ko rengê axa min bi alî te de diherikî,
 raperîna xwîna te haş dibû,
 Ko ava dengê min bi ser birîna te de dirijiya,
 zimanê te li hev digeriya, qublenameya te şaş dibû.
 te ez û xwe

ji
hev
d
e
r
n
e
d
i
x
i
s
t
i
n



Wexta ko min
bi dara newqa te digirt,
û bi tena serê xwe li ber bagerê dihejiyam,
di asoyên nalîna te de dihatim û diçûm
Tu di enîşka rê de

dibûyî
xwekuştina mûmê
Ez jî, di rûpela nermik a destê te de,
dibûm,
çîroka pêlan û qûmê

Min bazbenda revoyê Xanoyê çeng zêrînî
Min Dimdim û govenda aheng kevirînî
Min xirecira porê te yî aramkêş
Min pirepira siviksorê te yî bi kêş
Min rojhilata memikên te, lorîna landikên te,
hêlan û pêçek û zingîna navikên te,
li bin guhê lerza Xwedê

d
i
x
i
s
t
i
n

II

Wexta ko Goyînekî çavrijayî li ser kavlên
kendavên laşê te bûm,
di nav xura xweliya sîng û berên te de,
dinaliyam..

Di bin qehweyiya çermê êvara te de;
di bin saw û metirsiya zimanê bihara te de;
di bin daw û lingên hawara te de, ne tîr dibûm û ne jî
dimejiyam..

Ji û bi babelîska serxweş a çolistana laşê te,
ji û bi qaşa reş a moristana kaşê te, geh şa dibûm,
geh ditirsiyam..

Di nîveroja sincirî ya gazinên te de,
di berberoja serbilind de,
di bêhûdeyiya ava zelal a bazinên te de,
dikeliyam..

Di esra teng de, di berbejna tûj-reng de
wek çavtengiya tavên Gulanê, wek werisê gumanê,
wek lixwemikurhatina nemanê,
wek zîvê dûmanê,
bi ser pencereyên kesk ên bendemana te de,
dibariyam..

Wek berfa bêrikirinê,
wek qerfa ji dil a mirinê,
di tîna bîna kîna vîna birîna jîna te de,

rojekê diweşiyam û çend rojan

dihiliyam

III

Wexta ko dûmen û dûman;
bajarên xew sivik û Keman
li hev dipirsin

Wexta ko olana çîyan û peşkên barana destê şevê
ji hevdû himbêzkirinê ditirsin..,
wek tava westiyayî, wek hespekî bêxweşmêr mayî,
wek silava giyanê veçiriyayî,
keysa xwe li defa sînga şevgerinê xweş dikim..
Hemî kenarên hesreta te,
hemî hinarên bédengiya te,
hemî dildarên dergê û bargehê sosreta te,
bi lavlavê,

bi çîrusîna ximavê, geş dikim..

Hinarkên şermokî yên îstgehên dîroka te,
sipîbûna tîr û tarî ya neamadeyiya kevoka te,
bi kîlsa nîfirê reş dikim..

Lerz û ciwaniya barûdê

Derz û çavkaniya sirûdê,

û ciwarekî bêzar û xewn-har, bi şûrê xembariya xwe,
dabeş dikim..

Wexta ko kelehen stirana te ya gemkirî bi ser lêvên kurê
Zeynê de,

diherifin..

Wexta ko zersosinên bişirîna te,

li ber gurîna agirê demê, wek radestiya Memê,

dikerifin..

Wexta ko sorgul û sergulên xeftanê te,

garana rengên qedexe, û xwêdana gavanê te,

bîncikandina rêberên şevê û pizotên bibika pasvanê te,
di sergermî û bêbaviya bayê kur de,

diçelmişinin..

Wexta ko di şûna avî û xunavê de,

di kezêba peyvê û di surdariya lîlavê de,

singo û pêlav û çavnebarî û hovîtiya xwe,

dadiçikînin...

Wexta ko radihêjin piştîyên xwîna te,

û termê te yî ji şengebiyan,

û giyanê te yî ji tozê,

û bixçika te ya mişt raz û belgeyên Mîdiyan,

û li bazirganan, li rovî û tajiyan,

digerînin...

IV

Wexta ko dildarên te xwe ji gulhinarên
himbêzkirina te berdidin.

Wexta ko gustîlkên axê hînî oxira gîha û
yanan dibin.

Wexta ko keroşkên tarawgehê hînî xaçên berfa giran
dikin.

Wexta ko pinpinikên zaroktiyê pêrgî şoreşa gulan
dibin.

Wexta ko êvarên tenhatiyê, çîrokên sergermî û
berberiyê, ji bîr dikin.

Wexta ko keldûmanên şevbuhêrkên havînan bişîrîna
sitêrkan zencîr dikin.

Wexta ko pêlên şeyda yên xewna vegeerê pravên
bîranînên te dagîr dikin.

Wexta ko bêrîvanî bêrîkirina xwe bi ser sira bayê
sibê de dirijînin.

Wexta ko tavsorka bendemanê di asoyê guhanê
wêranê de dihejînin.

Wexta ko dewkêlên berbeyaniyê meşka felekê bi
nîfiran diçîrînin.

Wexta ko dayikên reşgîrêdanê, di landikên axînên
xwe de xweşmêrên bê vegeer, dihejînin.

Wexta ko xuşk û bira, wêneyên me, nûçeyên me, di
nav destmalên rengîn de dipêçin û bi rondikên
kêfxweşiyê dinimînin.

Wexta ko nameyên me di nav xwêdana destên wan
de diqermîcin.

Wexta ko hemî kolanên bajêr, hemî kêlikên bêkêr di
kêlika girî de diqurmîcin.

Wexta ko pencereyên xemgîn ên dilên yaran bi agirê
demê diqîçqîcin.

Wexta ko em bêrya nermahiya perîkên te dikin ey
balgeha xewrevînê!

Wexta ko em bêriya bîna hiriya te dikin ey doşeka
kulînê!

Wexta ko em bêriya tirs û şerm û lerza te dikin ey
Xwedana evînê!

Wexta ko em bêriya terk û werm û derza te dikin ey
çolistana birînê!

Wexta ko em bêriya lîsk û pevçûn û diziya
bêdengiya te dikin ey şevistana qîrînê!

Wexta ko em bêriya te dikin ey toza destbirak!

Wexta ko em bêriya te dikin ey soza bêmînak!

Wexta ko em bêriya te dikin ey Hedlê ya qereçî!

Wexta ko em bêriya te dikin ey goristana çavbirçî!

Wexta ko xoşewîst di nav pencên te de bêdeng dibin
û nema dibîşîrin.

Wexta ko darên xewn û xwezayan bi dû darbestan de
dikulkulin.ûra





Wexta ko tava heyvê xwe bi ser kêlan de diçemîne.
 Wexta ko keskesora miriyan esmanê me bêwaran
 dixemilîne.
 Wexta ko nermebarana paytextan giyanê sergerdanan
 ditepîne.
 Wexta ko guliya berfê dihingive hişê qonaxê û gavê
 dilezîne.
 Wexta ko cigareya dawîn di nav tiliyên derengmayî
 de vedimire.
 Wexta ko nameya pêşîn di hilma xêzan, di rêzên
 xweliyê de, dimire.
 Wexta ko hevalên westanê navnîşana te bi zikreşiyê
 dişewitînin..
 Wexta ko di koşeyên qûmistana nenas de, nasnameya
 bengîniya te, û movikên mizgîniya te, dikeritînin.
 Wexta ko di tenûra serberdayî ya Tebaxê de, li
 dorhêla Xanê, em li kelmozên cegerdar digeriyan..
 Wexta ko di nîveroja pêxwas de, bi sermestî, li ser
 dirk û qurincokan, berbi gunehkariyê de, em
 dimeşîyan..
 Wexta ko me bîstan û werz û bexçe bi kêfxweşî talan
 dikirin.
 Wexta ko lemên teze, darkokên bacan û îsotan di nav
 lapûşkên êrişê me de digiriyan.
 Wexta ko pîjên hetavê wek şûjînan xwe berdidan
 nava nivînan.
 Wexta ko toza ber lingê garana Mihemed Raî dibû
 dermanê birînan.
 Wexta ko xuşk û jinebiran lihêf ji ser me dikişandin
 û bi darê zorê em ji xewa giran radikirin.
 Wexta ko me balgehên xwêdangirtî di nav pencên
 xelmaşbûnê de bi xwe re dibirin.
 Wexta ko ji nû ve li ser kulêv xew li me zîz dibû.
 Wexta ko siya dara hinarê bi ser qehwa mêvanên
 bavê min de xwîz dibû.
 Wexta ko parsûyên demê di bin serê me de
 ditevizîn.
 Wexta ko şûseyên çirên xemê bi raperîna laşê me
 diderizîn.
 Wexta ko hêkên qelandî, penêrê badayî, desthilatiya
 nanê tenûrê, av bi devê salan dixistin.
 Wexta ko xweşiya dengê tembûrê, nalîna kûr a
 hinavên bilûrê, em ji hişê dixistin.
 Wexta ko li ser mesefê, me kerb û qehra ciwaniyê di
 ser û pozê hev re derdixistin.
 Wexta ko di kelkelê de me xwê vedidizî û me dara
 tûyê dihejand.
 Wexta ko me sorê tarî bi ser kirasê axê de dirijand.
 Wexta ko me bi ava hinarên mêxweş nifir û pitepita
 dayikan divejand.



Wexta ko me şopa helkihelka canê xwe, bîncikandina hemî rexên giyanê xwe li ser keviyên diwaran dihiştin. Wexta ko me marên çeman û pisîkên çêçixur bi şarezayî dikuştin.

Wexta ko piştî nimêja sibê em dişandin da ko mastê mîhan ji xaltîka Hacoyê bikin.

Wexta ko çav li xew me rêça xwe dirêj dikir da ko çûkên dilbijandinê li ser perdeyên qalind ên pencereyên yaran bilivin.

Wexta ko bi rê de, bi tiliya qereqûşkê, me qeymaxê mêst dişikand.

Wexta ko ji dil me rengê dengvedana evîna te ey şaro di şîrê xwîna xwe de dimeyand

Wexta ko dayika me sindoqa xwe vedikir, mewîj û bastêq li me belav dikirin.

Wexta ko me pirtûka xewnê û destnivîsa cih û şûnê ji sosreta mayinan re amade dikirin.

Wexta ko Torosê çavqerimî, şûrê xwe yî mijînî, ferhenga bihîvan di bîbîka çavê me de radikirin.

Wexta ko çîrokên xwîniyê, efsaneya tol û şîniyê wek xweliya heft gundan bi ser serê me de dadikirin.

Wexta ko zeviyên nêrinên me, mizgînxêra neviyên me bi başûrê sorgulan şa dibûn.

Wexta ko alên kenê me, ava qerisî ya denê me, di asoyên qehremaniya gulaberbero de li ba dibûn.

Wexta ko ez û tu di gerdeniya şoreşa şor de du morîkên windayî bûn.

Wexta ko sîbera min û te, di herikîna demê de, di zixta rimê de, di pepûkî û renckêşana Memê de, du nexşeyên windayî bûn.

Wexta ko rojhilat û rojava di xirecira xerxar û morî û karbanên te de, du oqyanosên matmayî bûn.

Wexta ko jiyana me hêjayî navê jînê bû...

Wexta ko ava rûbarê me hêjayî zêrîn gava Zînê bû...

Wexta ko çiçekên sînga te di bazdana salên min de hêjayî pesindana bînê bûn...

Wexta ko maçên me, germ û serberdayî, û hêjayî pîroziya xwînê bûn...

Wexta ko zikê te yî hevrêşimîn hêlîna derd û kulan û vehesîna bindestan bû...

Wexta ko zimanê te yî şêrîn bend û pend û qublenameya agirperestan bû...

Wexta ko lêva te ya narîn meyxaneya bêzar û sirmestan bû...

Wexta ko bînahiya çavên te, şevçira û xefîreya karwanê helbestan bû...

Wexta ko awirvedana min dihingivî bêhûdeyiya sorê te.

Wexta ko guregura min hildiperikî çeperên porê te.

Wexta ko rondikên min xwe dadidan rakêşana kirasê te.



Wexta ko darbesta min bi kotekî hildikişiya
hevrazê te.

Wexta ko helbesta min ji bişîrîna te ber bi
nemanê de serîşîv dibû.

Ey buhara reşgirêdanê!

Ey kevirno!

Ey toza gumanê!


Dilê min bi jena bêrîkirinê dilukumî

Bi kefenê bajarekî bê xwedîmayî dinixumî..

Stockholm
1996/10/26

PARABOL SERVICE

Hem arzan hem garanti



Navûnîşan:
ST. Sällslapets-v. 34
Bräding
Tel. 08-971500

HÛN RIKLAMÊN XWE DÎKARIN DI DÛGIRÊ DE BELEV BIKIN

RÛPELER BI 1000:- KRONÊN SIWÊDÎ
NÎV RÎPEL BI 600:- KRONÊN SIWÊDÎ

tel: 070 633 32 61



DUGIR *Kurdisk litteratur tidskrift*

Box 3437. S- 156 23 Hässelby - Sweden

BIRÛSK

Eyşe Şana wêrek û nebez, bi xwe gula civata me û geştêra esmanê me bûye. Ya ko ewê ji bo doza neteweya kurd û Kurdistanê, huner û zimanê kurdî, mafê jina kurd a bindest, her bê rawestan û bê supas xebitiye. Heger em li dîroka bakura Kurdistanê binêrin, nemaze di vê çerxê de, tekez E. Şan pêşenga hemuyan dibe! Ew çira, mom û ronahiya hemû hejar, jar û rebenan bûye. Berdewambûna wê li ser hunerê, dewlemendiya neteweya me bûye, berxwedana wê jî li dijî sitemê, kevneperestî û newekheviyê, şahnaziya me bûye!

Li rêkefta 18-12-1996 dilê vê hunermenda mezin û hêja rawesta û serê xwe danî. Ewê bi vê barkirinê, cihekî gelekî mezin vala hişt û ziyaneke ne sînordar gehiştîye hunera kurdî ya berbendkirî. Divê em xudan li wê û li kar û xebata wê derkevin, ev jî karekî pîroz e! Êdî em sojê didin ko em weke wê kêrhatî bin û dilsojên netewe û welatê xwe bin!

E. Şan di dilan de nemir e. Hûn xweş û serê we sax!

Hunermend Beşîr Botanî